Lacik deno piro şono ew albanê xwu cineno. Mar quçi mîyan ra vecîyeno yeno kay keno ew kay xwu qedênen. Mar şono ‘eni (yabî) quçi mîyan ra altun bîyaro. Lacik xwu bi xwu vano “Yaw! Eno bawo çend delû (bom) yo ew xizna nanîk (ha ya) a quçi mîyan da. Ez piroda marî bikşa ew xizna xwu yew ray di bigîra. Yew-yew altun ardiş ra ez xizna pêro yew ray di gêna.”

Lacik kerra gêno ew mar zî goreba di vîncoyê boça cê teber ra manena. Lacik deno marî ro ew boçî marî dera bena. Mar zî hêrs beno ew tadîyeno lacikî di deno ew lacik zî mireno.

Pî yeno kîye ew kîye ra perseno û wano: “Lacik kura do?” [Vanî:] “To lacik ray kerd yaban û hema lacik yaban ra nêamo kîye. Ma rayîrê pawit lacik çin yo ew nêyamo.”

Pî wano: “A he! Xula yew çî esto!”

Pîy deno piro şono hêgay ser cadê quçi. Pîy veyneno ki leşa lacikî kewta ya. Pî leşa lacikî ano hewaneno. Pîy goreba di-hîrê heftan vindeno ew elbanê xwu gêno newe ra şono cadê marî.

Pîy elbanê xwu cineno ew mar yewaş serrê xwu quçi mîyan ra veceno. Dewrêş babay ra ewnîyeno. Mar wano: “Hâ! Dewrêş baba to xeyr o, ti wanê çî?”

Dewrêş baba wano: “Ma rê heze (sey) verî ew ma xwu rê se kerdo, enwa de-wam bikê dostêye ma dewam biko.”

Mar wano: “Xula henî dawa ma qedîyaya.”

Dewrêş baba wano: “qey?”

O wano: “Keyfê ma, eşqê ma henî nêmend. Ez bocta xwu ya qoli bewnîya keyfê mi, kay mi bêro ez kay bika. Tî zî tirbda lacdê xwu bewnî keyfê to bêro ew ti elbane bicine!”

Mar wano: “Dawa ma zî ûta di qedîyaye ew ti bewnî rayîrdê xwu ez zî ewnîyena rayîrdê xwu.”⁴⁰

Z2. Werêameyîşê marê qolî

[Kuyruğu kesik yylanla barış. Hikâyenin son kısmına yani kıssadan hisse kısmına bakılırsa başlığının şu şekilde olması gereklidir: *Boca qole û gorrê birayê!* Kesik kuyruk ile kardeşmezari!]

Mêrdek şefeq ra amebi miyanê erdê korekî, korek aw dêne. Erdê korekî geleb bi. Varozî⁴¹ ey ra vatibî “ewro dora to ya, ti eşkenî hetanî şan sey zerrîya xo korekê xo awe dî.” Awe zaf bî. Mêrdekî zor dêne xo vatêne ha yela-ha yela ez awdayîşê korekî leze biqedêni u nêkewî tarî. Leze kerd, êre (yere) de awdayîş qedêna û huyeyê xo eşt kiftê xo ser, da ser rayîrê keyeyî.

Dewa ey, erdê ey ra bi lingî saetêke dûrî bî. Rayîrê dewe, yew şiverey bî. Tayê cayan de rast, tay cayan de zî pal, kendal û kaş bi. Nem saetêk ra pey, waşt hem boyâ xo bido hem zî yew cixara bianco. Senî serê yew qilî ra qelibîya â kewt yew raste, şî serê yew kerra de nişt ro, qutîya xo ya cixara vete û yew cixara pişte. Cixara yan nême bibî yan nêbîbî kema vere ey ra marêko bejî vejîya û ame rayîrî ser.

Çimê mîrdekî senî gina marî ro, cixara destê xo eşte û bi dime huyeyî ra, na dima. Marî senî famî mîrdekî kerd, xo şidêna û leze kerde. Nat û wetê rayîrî ra, miyanê kem û leman de remayene, mîrdekî zî bi huyeyê destê xo nenê dima. Mar çiqas remayêne mîrdek dima ra nevisiyayêne û fek ey ra veranêdayêne.

Mareko gewr û belek bi. Hema-hema qasê dimê huyeyî derg bi. Kerdêne-nêkerdêne mîrdekî fek ey ra veranêdayêne. Mar se ra remayêne mîrdek ey dima bi. Rey-rey ke mîrdek nêzdî ey bîyêne, sereyê huyeyê xo şanayne ey la mar zî gingilê dayêne xo ra û xo huye ra pawitêne.

Mîrdek pa wa zeliqîyabi. Mar dişmen bi, o zî rastê dişmenê xo amebi; ganî îşê dişmenê xo bidîyêne. Marî leze-leze xo nêdayêne dest. Can şîrin bi. Werîbînan demêko derg û dila carna-ceperna. Demêk ra pey, mar rastê yew qule ame. Senî çim gina qule, keyfê ey ame, xo bi xo va “ez xelisîyaya”. Verê xo da a qule û xo qule ra kerd war.

40 Laçîn, Şahab, *Estanikan û Meseleyanê Gelî ra*, Roşna, Diyarbakır, 2016, 60-61. Derleyenin notu: Gil (Diyarbakır/Eğil) mıntıkasından seksen yaşında olan okur-yazar olmayan Ali Kaya'dan derlenmiştir..

41 varoz: Dewan de, keso ke programê dora awe virazeno û awdayîşê baxçeyan taqîb keno.

Mêrdek ewnîya ke mar xo qule ra keno war şino, hema huyeyê xo na hewa û pey ra şana ey. Îlama Homayî rê sereyê huyeyî qey nêgina boca marî ro! Sereyê huyeyî ke gina boca ey ro, boce qasê di vincewî, gördeyê ey ra visiyê. Govde qulike ra şî, bi vîndî; boce zî teber ra cend rey erzîyê hewa û cil da xo, badê bî serdin, cay xo de bî sey qırşêk û mende.

Mabêr ra tenê wext vîyart. Rojêke o mîrdek û birayê xo pîya amê mîyanê erdê xo yê korekî. A roje, hetanî a saeta ke mîrdek awdayışê korêkî ra agêrabî dewe û raştê marî amêbî, reyna o wext işê ïnan qedîya û agêrê dewe. Reyna ê qilî ra qelibiyê û semedê ke yew cixara biancî niştî ro. Qutîya cixara vete û cixara pişte. Hema nêweriştibî o maro qol ïnan de vejîyo.

Xora badê ke boca marî tera (cira) bîbî, marî çend rojî nêeskabi qule ra vejîyo. Ê rojanê ke qule de bi birînê ey zaf dejayêne. Ne şewe ne roj hewn nêkewtêne çimê ey. Tim nalayêne. Nêeskayêne “boça” xo tado. Wexto ke a “boca” xo nata-weta tadayêne zî birîna ey ginayêne derûdorê qule ra, reyna gonî bîyêne û yew sancî o girewtêne, vatêne qey erd û asmên ey ser de yenê pê. Her wexto ke nê dej û tewan o girewtêne, o huye û o mîrdek ameyne vîrê ey. Rojî bi nê dej û tewan vîyartî. Birîna ey hêdî-hêdî bîne weş. Roj bi roj dorûverê birîne ameyêne pêser. Peynî de çikêkê birîne nêmend. La boçe êdî bîbî qole. Hinî (êdî) boça ey sey vere cu iş û kar nêdîyêne. Rey-rey sey verê cu waştêne werzo boça xo ser û keyf bikero la kerdêne-nêkerdêne nêeskayêne. Yan zî waştêne boça xo seydê xo wa bilefeno ke ey bifetisno, nêeskayêne. Ey zî fam kerd ke bi na boça qole êdî heqê ciyê newînan (inasarênan) ra nêno û bi na boce cu zor û zehmet a.

Hetêk ra cu bibi zor u zehmet hêtek ra zî mar bibi maro qol. Hem maranê bînan hem zî kerm û kêzî ey ra vatêne “Maro Qol”. Rey-rey zî pê xergêlê xo kerdêne. Kamo ke raştê ey biameyêne bi a leqame venga ey dayêne. Na leqame zorê ey şîne. Hetêk ra ê dejî ver hetêk ra zî heqê werdê xo ra nêameyîş û xergêlê kerm û kêzî ra kerdêne ke gêj bibo. Wexto ke nê ciyî ameyêne vîre ey, çimê ey bînê surî û roj bi roj dindanê xo ê mîrddekkî rê seqênenêne.

Wexto ke birîna marî bîbî weşe û qule ra vejîyabi rîye erdî ser, ê mîrdekî dima gérâyêne. Semedê ke ê mîrdekî bivîno û heyfê xo ey ra bigîro, bibi muraya gonî. Aye ra, ê derûdorî ra xo kişt a nêdayêne. Timutim o rayîr de bi û çimê ey şarî -ke uja ra şînê û ameyêne- ser o bi.

Senî çimê ey gina ê mîrdeki ra, verê keyfan ra kerd ke bifirro labelê dima keyf u şayîya ey bî hêrs û xem. Çimê ey bî surî, yew hîddetî o girewt, derhal seke biperro ïnan ser, gala her di birayan kerd.

Her di birayan nêzana se bikerî. Her yew cayêk a rema. Peynî de her di kewtî rayîrî ser û ver bi dewe şî. Birayo pîl o ke boca marî qol kerdibi vernî de, birayo bîn dima, remayêne. Mar zî ïnan dima bi. Qederêk bi no tewir da tê ver. Badê marî pil da xo ra, erziya birayê qijî ser; yew gaze daye caqê ey ro û çend jehrê

ey bi, heme verada canê ey. Pededayîşî ra pey mar bi keyf agera şî. Birayo qij zî ca de gina war, erd de mend û bî bara-bar û cara-cara ey. Birayo pîl ewnîya ke birayê ey ho erd de bareno, çend hebî kerreyî girewtî û ro birayê xo ame. Gava ke resa birayê xo, mar şibi, bibi vîndî; bira zî piştî ser o, erd de bibi kolî. Reng ey de nêmendbi, bibi zerd, zerd sey şîma.

Biraye pîlî bi ci zor û ci qeyame hetanî ke xo resna dewe êdî ruh birayê qijî de nêmendbi. Ne ax ne waxî ne zî çînayî ruhê ey nêçarnêne. O êdî bibi qurbanê birayê xo. Marî, birayê qatilê boça xo ra heyfê xo girewtbi.

Şarê dewe sey urf û edetê xo meyît şit, berd gorristan de defin kerd.

Êdî mar û o mîrdek bîbî dişmenê yewbînan. Mîrdek heyfe birayê xo dima gîrayêne. Mar zî, kela ey biney niştibî la zerrîya xo rehete nêkerdibi. Hema zî ê mîrdekî dima bi. Ci wext ke çim ginayêne boca xoya qole ra, o mîrdek ameyêne vîrê ey. Mîrdek zî kamcîn roje çim ginayêne gorrê birayê xo, mar ameyêne vîrê ey. Mabêñ ra zaf rojî vîyartî la dişmentîya înan nêvîyarte. Rojêke mîrdekî xeberê şawite marî rî, va:

-Ma na dişmentî xo mîyan de wedarîn û êdî kişîşê yewbînan dima nêgêrîn. Bêre ma wêre bêrîn.

Marî cewabê ey da va:

-Hetanî ke ez biewnî boca xo ya qole ra û ti biewnî gorrê birayê xo ra, ma do senî werê bêrîn!⁴²

Z3. Dostatiyê Mar

[Yılanla dostluk. Hikâyenin son kısmına yani kissadan hisse kısmına bakılırsa başlığının şu şekilde olması gereklidir: *Mezelî lajî û bueça quel!* Oğlanın mezarı ile kesik kuyruk!]

Rojê ke yo merdim zaf feqîr benu. Pê rençberîyê xu idarê xu kenu. Warîdat yî zî çînîbu. Yo mongayê yî bibî.

Rojê ke wuyê xu gênu, hêt hegaya şinu. Unîyenu yo mar sarê xu qul ra ardu tever u hêt yîya awir dunu. Rençber hêt mara şinu. Mar yenu zon û rençberî ra persenu vunu:

- Biye ma xu bînate di yo duesatî virazi. Ti her roj yo tasê şît mîr bîya u ez vera her roj yo zerd duna tu.

Rençber hêvîyê xu pê mar nêunu, labelê feqîrîyê xu un xu çîmon ver u teklîf mar qabul kenu.

Mar vunu:

42 Nêşîte, Mehmûd, "Werêameyîşê Marê Qolî", *Vate: Kovara Kulturi*, Dewreye diyine, humare: 7 (27) Payiz 2006, 58-60.

- Tî her sêrîsiway mîr yo tase şît bîya u ez vera tasê şît ra her roj yo zerd duna tu. Rençber vun:

- Temum.

Roj bîn rençber mongayê xu dueşenu, yo tasê şît abirnenu û gênu hêt mar ra şinu. Waxto ke qulê mar ra benu nizdî, mar sarê xu qul ra un tever. Rençber tasê şît hêt sarê mar ra kenu derg. Mar pêniyê şît werdîş xud, qirrikê xu ra yo zerd vecenu û dun rençberî. Rençber inê ser zaf keyf kenu û mar ra vunu: Ez siwa honê zî tur yonê tas êşit una û ver aci yo zerd gena. Mar qabul kenu.

În wazîyet gellêk serron dewun kenu. Rençber zaf benu zengîn û ina dostatîyê yîn zî dewum kena. Yo waxt derga pê rençber benu extîyar. Zonun ra kueno, nêşkenu sîyeru rayî ra, taqet bedenî yîd nêmunenu. Mar ra vun:

- Eg ti qabul bîkêrî wa vera mi laj mi her roj tur yo tas êşit bîyaru û ti zerd xu bidir yî.

Mar vunu:

- Eg laj tu zê tu sadiq yo merdum wa bîyaru. Rençber vun laj mi hol yo merdum.

Roj bîn lajî rençberî tas êşit xu genu û hêt mara şinu. Şit dunu mar û vera yo zerd genu. Înê ser heyret di munenu. Yo çend roj ena dewum kenu. Rojêk laj rençberî fîkrîyenu vunu:

- Ez ci ra her roj yo zerd gena? Ez in mar bikişî û zerdêg hê bîn 'erdîdê pîyorin hêw bîgerî.

Roj bîn in fikîr ser wuyê xu zî genu, tas êşit kenu de û kueno rayi. Yenu nizdîyê mar. Mar waxtog sarê xu qul ra vecenu, lajek wuyê xu kenu berz û dunu mar rî. Mar xu qeldenu û wuye ginenu bueçê yîr û bueçê mar qerifiyena. Mar hîyers benu û dun lajêk rî. lajek cey xu di mirenu.

Gazî hewar bêna, buabîyê lajêk eşnawenu, qahrîyenu, lajî xu şueno û kenu mezel. Binati ra çend roj şînî, rençber rojêk hêt mar ra şinu. Mar ra benu nizdî, mar sarê xu qul ra un teveri. Rençber mar ra persenu vunu:

- Duest mi, tu ci ra laj mi kiştu?

Mar vunu:

- Lajê tu tamahkarî kerda, yî ez kişînê labelê wuyê yî gina bueçê mir. Ez hîyers bîya, mi da piri û wi zî merdi.

Rençber inê ser zaf qahrîyenu û mar ra vunu:

- Bîyê ma ina mesla xu vîra bikir, wa duestatîyê ma zê vêribu.

Mar vunu:

- Tî heta bonî in mezelî lajî xu ra û ez bonî bueçê xuya quel ra qet'a duestatîyê ma zê vêr nêbena...⁴³

43 Erdogan, Hatip, *Genç Çevresine Ait Masallar (Metin-İnceleme)*, Bingöl Üniversitesi

Z4. Laik be Morira

Beno, nêbeno. Laikê do doman şuanê bijêku beno. Her roc bijêkanê xo cêno, beno, birr ra çirayneno. Qawala xo ki caru xo ra düri nêfino. Laik kemerê sero niseno ro. Xorê pira pira qawala xo puf keno. Bijêki ki xorê melaim melaim çerenê. Qawale ra sedê da zaf wese bena teber. Na seda ra theyr u thurê birri pêro vengê xo birrnenê, gos danê. Yoxro ke nejdiyê laiki de, bînê kemere de lona mori bena. Seda qawale ke birrina, mor beno teber. Verê lona xo de, fekê xo ra sebeta laiki zerrnê dano waro. Tepia sono, kuno lona xo. Laik zerrnê xo cêno. Zaf sa beno. Esqanê xo ra xo erzeno we. Bijêkanê xo derdest dano arê. Raa çeyi nano xo fek ra. Yeno çê. Zerrn ano, dano piyê xo. Vano: "Hal u meselê min u mori nia bi. Miqawale cinite, ey mirê na zerrn ard, verê lona xo de da waro." Piyê laiki zaf sa beno. Vano: "Bîko, eke henio, mevinde her roc bijêku bîcê, so o ca, uncia qawale bicine! O to rê zerrnêna ano."

Laik quesê piyê xo cêno. Bijêkanê xo dano arê, beno uca. Tepia kemere sero niseno ro. Qawala xo cineno. Mor seda qawale ke birrina, laiki rê zerrnêna ano, çêberê lona xo de fekê xo ra dano waro. Halê laik u mori nia beno. Rocê, pi lacê xo ra vano: "Bê, ni mori bikise. Jü rae de wayirê zerrnu bime. Na ȝezna zerrnu ya zerrê mori dera ya ki lona mori dera." Laik quesê piyê xo keno xo gos. Uşira xo ki tey cêno. Bijêkanê xo saneno xo ver, sono uca. Uncia kemere sero niseno ro, qawala xo cineno. Mor uncia beno teber ke laiki rê zerrnê verê çêberê lona xo de warodo. Laik çiya xo derdest bar keno, dano dimê mori ro. Dimê mori qulfino. Mor ki xyl beno, peyeka laiki de cêno, dano pede. Ağwiyê xo keno canê laiki de. Laik nata-bota perreno we, gineno piro, mireno. Piyo feqir dano çok u zaniyanê xo ro. Ebe şin u şivan lacê xo beno, dareno we. Her roc serê mezela lacê xo de berbeno, jibenno. Dima, xo xo de vano: 'EZ gereke hêfê xo mori ra bicêrine ke bicêrine...! Hem hêfê lacê xo cênan, hem ki benane wayirê ȝezna zerrnu.' Na rae ki mormek qawala lacê xo cêno, sono. Uncia a kemere sero niseno ro, cineno. Xeylê waxt cineno. Çimê feqiri çêberê lona mori ra perrenê. De! Çimoro, çizerrno. Uncia ke cineno, mor yeno nejdiyê çêberê lona xo. Vano: „So, so, feqir, so! Hunde ke to mezela lacê xo de nia da, hunde ke midimê xo de nia da, ma dost nêbeme.”

Teseliya mormeki ki birrina, kor - poseman terkneno, sono çê xo.⁴⁴

Yaşayan Diller Enstitüsü Zaza Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, (yayınlanmamış yüksek lisans tezi) Bingöl 2015, 94-96.

⁴⁴ <http://zazaki.de/zazaki/saniki/laikbemorira.pdf> (erişim: 08.04.2018: 18: 30). Bu hikâye şu eserden alınmıştır: Cengiz, Daimi, *Dersim Fablları-I*. Kalan Yayınları, 2001, Ankara. Hikâyenin kaynağı kişi: Besera Qemerê Khali 1989-Korta Sure. Bk.

Z5. Mar û Cityer

[Yılan ile çiftçi. Anlaşlan şairlik zevkine sahip olan yazar, duyduğu bu hikâyeyi, başarılı bir şekilde şiirle ifade etmiştir.]

Yew dew bîbî, zergûnê kerden wet ra
 Însûn tedi keyfweş bîni, her het ra
 Cityer şîn yegê xwe ûmên, timûtim
 Ge ho mûngûn ge zî golikûn dim
 Însûni xwe d' nemr bi, şîrin bi heq
 Kergê çewî kiş nikerdên, bîlaheq
 Nûnê xwe bar kerden dêñ teyr-tur, ina b'
 Havilê yi resêni herkes, yewna b'
 Yo roc myûn çalê kerrûn d' xuşî vicyê
 Üwnîya yew-di kerray lîr bîyê, ricyê
 Dî, yew mar ho uca di, hema kung bi
 Çey bin ra nitersa tira, reng-reng bi
 Nûnê kerd felqê, na ver, mar kerd bar
 Va, weşî û can, meters ez niben neyar
 Da piro şî yega aw da, hîn bî şew
 Qefiliyabi, va, xwe arê bid' şîr dew
 Dî, vêr kerrûn di çîk ho mar fek ra
 Beriqyen, nar û vîyert şî, mar wek ra
 Bi nezdi tira, şî vêr qûçê kerrûn
 Dest ki eşt ci, va, hû in mûnen zerûn!
 Girot esteri test cêbê xwe, bi şay
 Kotib' xeyalûn, şî kîye bîb işey
 Hin bişîn yega, barê mar' tey berdêñ
 Myûn çalê kerrûn di, barê yi verdêñ
 Mar zî tim yew ca ra, altun vetêñ ci r'
 Îna vîyert zemûn, hîn resa sewir
 Cityer maldarê xwe diz af bib' maldar
 Dormalê yi, tor dew ci rî bib' dêndar
 Dêyn biden niwaştêñ peyser çew ra qet
 Feqîr, belengaz tim ûmeynî yî het
 Mar yi ra, wi marî ra, wird Hûmay ra
 Weş bî, keyfweş bî, şukir henî pay ra
 Rocûn ra yew roci cityer niweş kot
 Recef girotbi, nieskêñ bikur sowt

Biney çim kerd a, va, lac' mi byi mi ver
 In nûn ber' myûn qûçê yeğe ma yer
 Uca di ron', meters, yew mar vecyen yeno
 Xwu bid pey, vindir, y idim zer mûneno
 Biger bî kîye, qarış mar meb ci rey
 Ti ûn xwe ser, ma ser bêhesab gurey
 Lac yiv a, mereq mekir, sey tu ken baw
 Ci qêde ki tu vûn, o qêde ken, paw
 Sewir nûn berd nar û, vindert pawê mar
 Hinzar heb luwî hê geyrenî yi ser
 Babî tir ava, mar ûn, nûn ro yew zer
 Va, ez ehmeq nîyo, qey bikur yew ver
 Va, ez kerra pa kur, bikiş mar yew ra
 Erd aşûn, zerûn vec, ber' towre-towre
 Kerra kuwa pa, boçê mar' kot tira
 Mar' darsî vist pa, va, ci vazên mi ra!
 Mar boç ra bi, lac gûn' xwu ra, eya şew
 Va, lac' tu mar' do pede, ver' çin çin bi çew
 Ciyer se bikir, lac merd, berd defin kerd
 Teziye k' qedyê, nûn' mar' het qûç ra berd
 Mar vecya, w iyi ra ho xwo paweno
 Cityer pers ava, maro, ho sebeno?
 Mar' va, lac kerra kuwa mi, ez kiştên
 Boç' mi şî, yi ez kiştên, mi nikiştên
 Cityer ûwna mar ra, boç pa çinî ya

Hin fehm kerd û zûna yi, mesla senî ya
 Va, byi ma hunc pê hol bî, maro se vêr
 Ci bîyo bîyo vîyarto, her ci xêr
 Mar' va, *heta ki dêc boç mi vîr di bû*
Lac' tu merd, leşê yi bine erd di bû
 Ma ina darb xwu vîr ra nikên **bina**
 Di ra adir ki kot tê, nişin **hun** a
 Sey ina mesla, bikir ümbazê **seq⁴⁵**
 Ti se kên bikir, kerrê yi bena leq⁴⁶

45 Bina: binra; qethen. Hun: hewn. Seq: şik; şubhe; guman

46 Ersoz, Umer Farûq, *Kekû*, Roşna Dîyarbekir 2013, s. 22-24.

Sorani Hikâyeler:

S1. Ne mar kilkî le bîr deçê ne baxewan kurî

[Ne yılan kesik kuyruğu unutur ne de bağban oğlunu]

Le zemanî zor kon da, pîremêrdêkî hejar hebû, jîyanî estem û pirr le teng û çellemey xoy le rîgay baxewanî û darfiroşiyewe ra debiward.

Pîremêrd hewt kiçî hebûn, xuda be serî pîrî kurêkî pêdabû. Hemû rojê beyanî zû le xew helldesta, tewr û das û gurîsî helldiegirtin û deço daarbirîn. Êwaran hîlak û mandû degerayewe û darekanî defroşitin û pêwîstîyekanî xawxêzanî xoy pê dabîn dekirdin.

Rojêk le nêwan daristanêkî cir da xerîkî darbirîn bû, le pirr marêkî gewre be qet ejdîhayekî lê peyda bû. Pîyawey besteziman serî lê çewaşe bû. Neydezanî ci bika û çon xoy le dest ew mare rizgar bika. Pêy wa bû her êsta pelamarî deda û deyxwa. Ke cî lêy hate pêş û mandû nebûnî lêkird û kutî (gotî):

- Be yek şert nebê le dest min rizgarît nabê!

Pîrepîyawe be peşokawî kutî:

- Qurban tikaye le min waz bene. Her destûrêkit hebê be çawan serim de rê daye.

Mare zelameke kutî:

- Emin dengî şîmşallim zor pêxoşe, eger bitwanî şîmşallim bo lêdey, ewe wazit lê denim û padaşîşit dedemê. Egîna her êsta detkujim.

Pîyaweke şîmşalljenêkî fire baş bû, be bîstinî em qiseye hatewe ser xo. Destî bo berpiştenekey bird û şîmşallekey derhanî û destî kird be şîmşall lêdan, heta marî zordar mandû bû. Le paşan pîyawey bang kird û kutî be diway min da were. Pîrepîyawe be laremlî kewte şîwên mareke. Geyîstine ber derkî eşkewtêk, destî radaşt û be qeradû misqall alltûnî da be pîyawe û pêy kut:

- Hemû rojê were şîmşallim bo lêbide û emîniş alltûnit dedeme. Belê pîrremêrd hemû rojê deçû şîmşallî bo lêdeda û alltûnî xoy werdegirit. Wirde wirde xoy girt û dewllemend bû. Xoy saz kird biçête hec. Pêş ewey birrwa, kurekey fêrî şîmşalljenîn kird û paşan şîwênî marekey pêşan da û raspardey tewawî pêkird ke ci bika û bo kiwê biçe û çon bicüllêtewê.

Pîrepîyawe berew hec kewte rê. Kurre şîmşallî hellgirt û rûy kirde şîwênî mareke. Hewallî çûne hecî bawkî pê ra geyand û diwaye hêndêkî şîmşall bo lêda. Marekeş birrêkî alltûnî pê da. Çend rojêk bem çeşne têperî. Kurre katêk be wirdî serincî da eşkewteke dîtî hemûy alltûn e! Le ber xoyewe kutî:

- Babim helley kirduve! Bo ci ew marey nekuştûwe û ew hemû alltûney weçing nehêname?

Kure we temah kewt, çûwe mall û şîmşîrêkî konîyan bû hêney û rrûy kird daristan bo kuştinî mareke. Le katêk da ke mareke xewtibû xoy geyande ser. Xêra

şimşîrî hellêna û yet be hêzî xoy dayhêna û kilkî marî perand. Marke xeberî bûwe, pelamarî kurrey da girtî û xwardî.

Pîrepîyaw le zîyaretî hec gerawe, dîtî hemû binemallekey reşpoş in! Pirsîyar kird, ewanîş karesatekeyan bo gêrawe.

Pîyawe paşewey serî sûk bû, şimşallî dest daye û berew şîwêni caranî kewte rê. Diway hewalpirsî hêndekî şimşall bo lê da. Mare her be şêwey caran hêndekî alltûn daye û pêy kut:

- Birro û itir meyewe ew layene!

Pîyawe kutî:

- Bo qurban?

- Çunke heta emin seyrî kilkî birrawî xom bikem û toş seyrî cilî xiwêneyî kurreket bikey, qet le yektirî dill pak nabîn.⁴⁷

Türkçe Hikâyeler

T1. Sende çocuk, bende kuyruk acısı oldukça biz dost olamayız

Eski zamanlarda bir beldede fakir bir adam varmış. O kadar fakirmış ki, köyün çobanı bile ondan zenginmiş. Adam bir gün dağda oduna giderken sıcaktan bunalmış. Bu vaziyette ağını açmış, sanki “Su! Su!” diye bağırın bir yılan görmüş- Adamcağız kendi kendine, yılanı sulaması lazım geldiğini düşünmüştür. Araya araya bir miktar su bularak yılanın üzerine dökmüş. Yılan da hakikaten susuzluktan yanmakta olduğundan, adamın döktüğü suyu büyük bir zevkle yalamaya başlamış ve adamdan memnun olduğunu belirten bir tavırla oradan çekip gitmiş.

Birkaç gün sonra, adam yine ormana gittiğinde yılanı görmüş; yılan da adamı görünce boynunu bir tarafa kıvrarak “Ne yapayım ben?” der gibi çekip gitmiş...

Fakat adam, dağdaki işini bitirip de evine dönerken, yine yılanla karşılaşmış. Fakat bu sefer yılanın ağızında bir altın varmış, adamı görünce oraya adamın geçeceği yola bırakıp çekip gitmiş. Adam da altını alarak eve gelmiş, ikinci gün yıldandan memnun olduğu için, sevinçle bir kaba süt doldurarak yılanı gördüğü yere varmış ki yılan yine ağızında bir altınla adamı bekliyor. Adam sütü bir yere bırakmış, yılan da hemen ağızındaki birakarak süte koşmuş.

Adam altını alarak geri dönmüş ve arkadaşlık başlamış. Yani adamdan süt, yıldandan altın... Derken adam zengin olup hacca gitmeye karar vermiş; oğluna

⁴⁷ Weyşî, Resûl-Futûhî, Suwâre, Çâwge I, Çâpxâne-ê Mukriyânî, Hewlêr 2013, 161-163. Aynı hikâyeyin Soranice başka bir varyantı (*Ne deve süttî ne de Arabîn yüzü*) için bk. aynı eser, s. 156-162.

da meseleyi uzun uzun anlatarak her gün bir şişe süt götürüp altını almasını söylemiş. Adam hacca gittikten sonra çocuk, bir gün sütü götürüp altını almış. İlkinci gün, "Ben" demiş, "her gün süt götüreceğime, yılanı takip eder, altının yerini öğrenir, onu öldürürüm. Ondan sonra da altınların tamamını alır, yıhana süt getirmekten kurtulurum" demiş. Hakikaten ikinci gün sütü getirip altını aldiktan sonra, gitmeyip yılanı beklemiştir. Yılan tam deligiğine başını sokmuş, kuyruğunu da çekerceği zaman çocuk elindeki balta ile yılanın kuyruğını kesmiş. Fakat yılan can havliyle çıkarak çocuğu sokup öldürmüştür ve deligiğine geri girmiştir, ama ölmemiş.

Adam hacdan gelip durumu öğrenmiş; ama yine de yıhana minnettar olduğu için süt götürmeye ihmal etmemiştir. Bir gün sütü götürdüğünde yıhana, "Kabayat bizim çocukta. Ben sana süt getirmeye devam edeyim, sen de bana altın getirmeye devam et!" dediğinde, yılan getirilen sütü içip lisân-ı hâl ile şöyle demiş: "Arkadaş! Bu zamana kadar böyle devam ettik. Fakat *bende kuyruk, sende de evlat acısı olduğu müddetçe, biz dost olamayız*. En iyisi sen rızkını, ben de rızkımı başka yerlerde arayalım" deyip çekip gitmiştir.⁴⁸

T2. Aylanın qoyrük yarası, çubanın oğul yarası yaddan Çıxmaz

Bir çuban otlaqda doarları otarırmış, o çox susamış bir ilanı gürüb suruşar:

- Ilan qardaş nə üçün belə susadın?

Ilan deyr:

- Çuban qardaş içim yanır çox isti dir.»

Çubanın orgı yanar və gedib bir masa süt gətirib ilana verir. Ilan sütü gütürüb onun qarşılığında çubana bir qızıl səkə verr. O gündən çubanla ilan arträq yaxınlaşarlar. Hərgün çuban süt verib ilandan bir qızıl səkə alar. Çuban zənginləşib ziyan yolculuğuna çıxar. Ama yolculuqdan onçə oğluna ilanla olan alış verişin anladıb, hərgün ilana süt verib qarşılığında qızıl səkə almasını öyrə dər. Çubanın oğlu bir neçə gün süt verib qızıl aldıqdan sonra ilanı oldurub qızılaların hamisini bir yerdə ələ keçirtmək fikrinə düşür. O sütü aparıb ilanın onünə quyar ilan sütə yaxınlaşanda cumaqla onun başına vurmaq istər. Ancaq cumaq ilanın quyruğuna dir və onun quyruğunu qupardar. Ilan yeyin yuvasına girib ozunu olumdən qurtarar. Fərst dalıcı gəzni ilan bir gün çubanın oğlunu sancıb oldurır. çuban yolculuqdan dünüb oğlunun olduğunu gürr. O yenə də qabaqlarda ki kimi ilana süt aparıb ona süylər:

- Səninlə mənim aram yaxşı idi. Mənim oğlumu niyə sanhib oldurdun?

Ilan sütü almayıb çubana deyr:

48 Kılıç, Cevdet, *Bilgelik Hikâyeleri*, İnsan yayınları 2008, 60. Bu hikâyeyinin "Kuyruk Acısı" adıyla farklı bir varyantı şu kitapta da yer alır: Demir, Necati, *Anadolu Türk Masalları Derlemeler*, Ötüken İstanbul 2017, 265-267.

- Çuban qardaş daha bizim dostluğumuz tutmaz. Çünkü *Ilanın qoyrügen yarası çubanın oğul yarası yaddan çıxmaz*.⁴⁹

Not: Azeri Türkçesi’nde aynı atasözünün şöyle bir varyantı ve hikâyesi de vardır:

*'Ereb'den çıxmaz oğül açûsi îländen çıxmaz qoyrük açûsi.*⁵⁰

Sonuç

Hemen hemen aynı anlamları ifade eden bu ortak atasözleri ve ilgili ortak hikâyeler, Ortadoğu kavimlerinin ve bilhassa Müslüman halkların kültürel etki-leşimi, müsterek alglarını, değer yargılarnı ve zengin kültürlerini göstermele-ri bakımından oldukça önemlidir. Fabl türü olan bu hikâyelerin kaynağı çok es-kilere Hint-İran ortak dönem kültürüne dayanan (çünkü İslâm öncesi Sasanîler döneminde Hintçe’den Pehlevî diline, İslâm sonrası dönemde Arapça’ya, daha sonra tekrar Farsça’ya çevrilen *Panctantara: Kelile ve Dimne* adlı eserde de “Kuyruğu kesik yılan” deyimi yer almaktadır ve bunun Hint kültüründe muhtemelen hikâyesi devardı) bir tek hikâye olsa da, herbir Müslüman halkın kültü-rasında sosyal, ekonomik, coğrafi ve kültürel şartlar çerçevesinde zamanla farklı şekillerde gelişerek çeşitli varyantlarla günümüze kadar gelmiştir.

Tarihten gelen bu ortak kültür havuzunun, ulusçuluk fikri marifetiyle za-manla yağmalandığı, milletlerin kültür birikimine de ciddi darbe indirdiği, bunun sonucunda da bugün kimsenin neredeysi diğerini sevmediği toplumlar haline gelindiği eseple izlenmektedir. Hâlbuki bu tür mukayeseli çalışmaların sayısını artttırmaya özen gösterilerek ortak kültürel miras canlandırılırsa toplumların birbirlerini daha doğru tanımlarına ve ortak kültürel değerlerde buluşmasına vesile olacaktır.

Hikâyelerin azamî kısmından çıkan sonuca (kissadan hisseye) göre: insanlar arasındaki ilişkilerde karşılıklı çıkar devam ettikçe önce *dostluk*; açgözlülük vs. nedenler sonucu oluşan *düşmanlık* ve ardından menfaat icabı *dostluk kurma arzusu* şeklinde üç süreç izlenmiştir. İnsan bir şekilde düşmanı sembolize eden yılanla maddi çıkara dayalı dost olmakta ve insanın kontrolsüz mal hırsı, açgözlülüğü ve toptan sahiplenme duygusu bu dostluğun düşmanlığa dönüşmesine yol açtıktan sonra her iki tarafın zarar görmesine yol açmaktadır. İnsanın yaşa-nan acının dinmesinden sonra onun mal hırsı ve açgözlülüğü dürtüsü, yılanla veya düşmanla tekrar dostluk kurmaya istahlandırsa da iki tarafın yaşadığı acı-ilar, artık eski dostluğun kurulmasını imkân sağlamamaktadır.

49 Cəfərzadə, Həsən- M., *Qamus Namusdur; Qamusu Uzanan Əl Namusa Uzanmış Deməkdir*, Təbriz- Yaz 2013.

50 Yûsufî, Muhammed Hasan, *Êl Sozleri*, Tahan 1377 hş., s. 144-145.

Kaynaklar ve Kısaltmalar

- Aksoy, Ömer Asım, *Atasözleri ve Deyimler Sözlüğü*, I-II, İnkilâp İstanbul 1988.
- Albayrak, Nurettin, *Türkiye Türkçesinde Atasözleri*, Kapı Yayıncıları, İstanbul 2009.
- Berecî, Hesen, “Kârburd-ê Şutur der kinâyât u Meselhâ-yê ‘Âmiyâne” Devvumîn Kongre-î Beynelmilelî-yê Şutur, Dânişgâh-ê Hurmuzgân 2-3 Behmen 1395 hş.
- Beyhaqî, Ebû'l-Fazl Muhammed, *Târîh-i Beyhaqî* (nşr. Ali Ekber Feyyâz), Meşhed 1383 hş.
- Bingöl, Abdulkadir, *Gotinên Pêşîyan û Biwej*, Weşanên Na, İzmir 2014.
- Cəfərzadə, Həsən M., *Qamus Namusdur*, *Qamusu Uzanan Əl Namusa Uzanmış Deməkdir*, Təbriz, Yaz 2013.
- Çiya Mazî, *Ferhenga Gotinên Pêşîyan*, Weşanên Elma, 2005.
- Dêhxodâ, Ali Ekber, *Emşâl û Hikem*, I-IV, Emîr Kebîr, 1363 hş.
_____ *Luğetnâme*, “Mâr” maddesi.
- Demir, Necati, *Anadolu Türk Masalları Derlemeler*, Ötüken İstanbul 2017.
- Dêrşewî, Mele Mehîmûd, *Mıştaxa Çiya Ji Gotinên Pêşîya*, (Latinize: Serbest Zaxoyî) Stockholm 1989.
- Erdoğmuş, Hatip, *Genç Çevresine Ait Masallar (Metin-İnceleme)*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Zaza Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı, (yayınlanmamış yüksek lisans tezi) Bingöl 2015.
- Ersoz, Umer Farûq, *Kekû*, Roşna Diyarbekir 2013.
- Gündoğar, Sinan, *Kürt Masalları*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul 2015.
- Hazrâ'î, Emîn, *Ferhengnâme-ê Emsâl û Hikem-ê Îrânî*, İntisârât-ê Nuvîd, Sîrâz 1382 hş./2003.
- Hesen, Bîlal, *Ji Wêjeya Gel: Pend û Peng*, 2008.
- <http://www.dimilki.net/default.asp?sid=4> (Erişim: 06.04.2019: 09: 00)
- <http://zazaki.de/zazaki/saniki/laikbemorira.pdf> (erişim: 08.04.2018: 18: 30)
- Kılıç, Cevdet, *Bilgelik Hikâyeleri*, İnsan yayınları 2008.
- Laçîn, Şahab, *Estanikan û Meseleyanê Gêlî ra*, Roşna, Diyarbakır, 2016.
- Muctehîdî, Ali Asğer, *Turkî Dîlînde Meseller*, Tebriz ts.
- Nêşite, Mehîmûd, “Werêameyîşê Marê Qolî”, *Vate: Kovara Kulturi*, Dewreye diyine, humare: 7 (27) Payız 2006.
- Oncu, Mehmet, *Gotinên Pêşiyân*, Enstîtuya Kurdî, Stenbol 1992.
- Qâzî, Qâdir-ê Fettâhî, *Emsâl û Hikem-ê Kurdî*, İntisârât-ê Dânişgâh-ê Tebrîz, 1364 hş./1987.
- Rahmândûst, Mustafa, *Fovt-ê Kûzegerî: Meselhâ-yê Fârsî û Dâstânhâ-yê Ân*, I-II, Tahran 1390 hş.

- Resmî, ‘Ârike, “Neqş-ê Îrâniyân der Peydâyiş-ê Nemâd-ê Pizişkî”, *Faslnâme-ê Târix-ê Pizişkî*, Yıl: 4, Sayı: 10, Bahar 1391 hş., s. 33-77.
- Sayar, Sait, “Evrenselin Etnisiteye İndirgenmesi ya da Kürt Masalları”, *Studies of the Ottoman Domain*, Cilt: 3 Sayı: 4 Şubat 2013.
- Seccâdî, Seyyid Abulhamid Hayret, *Pendê Pêşînân*, Hewlêr, 2010.
- Seydayê Tîrêj, *Serpêhatiyên Kurdan (Dâstânhâ-yê Kurdi-yê Kurmâncî)*, İran/ Qum 1393 hş.
- Sohrabînijâd, Muhammed, <https://wwwiranboom.ir/shekar-shekan/zabanzad/3853-ta-mara-dom-va-tora-pesar-yad-ast.html> (erişim 04.06.2019; 20:15)
- Şekûrzâde, İbrahim, *Deh Hezâr Meşel-ê Fârsî*, Meşhed 1372 hş.
- Şinasi, *Durûb-ı Emsâl-i Osmaniye*, (haz. Süreyya Beyzadeoğlu), 2003.
- Tarduş, İbrahim, *Bikaranîna Çirokêne Kurdi di Perwerdeya Zarokan De (Kürt Ma- sallarının Çocuk Eğitiminde Kullanılması)*, Mardin Artuklu Üniversitesi, Yaşa- yan Diller Enstitüsü, (Yayınlanmamış Yüksek Lisns Tezi) 2015.
- Tîgrîs, Amed, *6762 Gotinêne Peşîyan*, Weşanêne Rewşen, Stockholm 2001.
- Vekiliyân, Seyyid Ahmed, *Temsil û Mesel*, 1395 hş.
- Weysî, Resûl-Futûhî, Suwâre, *Çâwge I*, Çâpxâne-ê Mukriyânî, Hewlêr 2013.
- Yurtbaşı, Metin, *Sınıflandırılmış Türk Atasözleri*, Ankara 1994.
- Yûsufî, Muhammed Hasan, *Êl Sozleri*, Tahran 1377 hş.
- Zinar, Zeynelabidîn, *XWENÇE I: Gotinêne Peşîyan, Kilam-Dîlök û Çirok*, Stock- holm 1989.
- Zûlfiqârî, H.-Şîrâzî, A.E., *Bâverhâ-yê ‘Âmiyâne-ê Merdum-ê Îrân*, Neşr-ê Çeşme, Tahran 1394 hş.
- Zûlfiqârî, Hesen, *Dâstânhâ-yi Emsâl, İntişârât-i Mâzyâr*, Tahran 1385 hş.
 _____ *Ferheng-ê Bozorg-ê Žerbu'l-Meselhâ-yê Fârsî*, I-II, Tahran 1388 hş.

A: Arapça.

F: Farsça.

hş: hicrî şemsî.

K: Kurmancî.

S: Soranî.

T: Türkçe.

MELA MEHMÛD AN JÎ HEMÎDÎ: ŞA'IRÊ BERÎ MELAYÊ CIZÎRÎ Û YEKEM MULEMME'A KURDÎ

(*Mela Mehmûd Or Hemîdî: The Poet Before
Melayê Cizîrî And The Writer Of The First Mulemme'*)

Tehsîn İbrahim DOSKİ¹ - M. Zahir ERTEKİN²

PUXTE

Welî ku ji sernavê jî eskere dibe, du diyardeyên nû, dê cih bigirin di vê nivîsarê da. Yek jê, bi dîtina mulemme'a Mela Mehmûd (Hemîdî) keşifbûna şâ'irekî berî Melayê Cizîrî ye, yanî, berî Melayê Cizîrî, şairên kurmanc hebûn. Eger Elî Herîrî hevçaxâ Melayê Cizîrî be, vêca destpêka edebiyata kurdî kurmancî ya klasîk bi dîtina helbesta Hemîdî tê guherîn. Ya din, guherîna tarîxa nivîsına mulemme'a kurdî ye, wate; beriya Ehmedê Xanî ji sed salî zêdetir mulemme'a çar zimanî ya bi kurdî-kurmancî hatîye nivîsin. Ev nivîsar li dor hin boğûn û angaştên halbestkar û helbestkariya kurmancî ya klasîk ya berî Melayê Cizîrî dizivire. Herwiha li ser mulleme'a Hemîdî -ku destpêka mulemme'a kurdî-kurmancî ye- û şâ'irê wê radiweste. Berî ku mijar bê ser Hemîdî û mulemme'a wî destpêkeke kurt bo mijarê dê bihê pêşkeşkirin. Pişti wê derketina mulemme'an û pêdiviya wan bo şairan, mulemme' li nav şairên kurd û psikolojiya nivîsına mulemme'an dê were nirxandin.

Peyvîn Sereke: Destpêka Edebiyatî Kurdi, Mulemme', Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mela Mehmûd (Hemîdî).

ABSTRACT

As it is obviously understood from the title there are two new topics to be dealt within this article, the first of which is about a new discovery of a poet, namely Mela Mehmûd (Hemîdî), who has lived before Melayê Cizîrî

1 Lîkoler

2 Doç. Dr. Zanîngeha Bingöl, Fakulteya Fen Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyatî Kurdi (zahirterekin@hotmail.com).

(Nîşanî), owing to a *mulemme'* (a poem consisting of at least two languages) written by him which means that there used to be Kurdish poets before Melayê Cizîrî. If Elî Herîrî is accepted as a contemporary with Melayê Cizîrî, then Hemîdî's poem should be regarded as the beginning point of the classical Kurmanji dialect of Kurdish. The latter is about the change in the date of the first written *mulemme'* which means that there were *mulemme*'s written in Kurmanji Kurdish a century before Ehmedê Xanî. This article covers certain viewpoints and arguments about the poetry and poets before Melayê Cizîrî. It also refers to the first *mulemme'* written in Kurmanji Kurdish and to its poet Hemîdî. There is an introductory section which includes some background knowledge before giving details about *mulemme'* and Hemîdî. In the second section the reader is informed about the emergence of *mulemme'*, the reasons why Kurdish writers needed to use it, its position among Kurdish poets and the mood that produced it.

Keywords: The Beginning of Kurdish Literature, *Mulemme'*, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mela Mehmûd (Hemîdî)

DESTPÊK

Ji bo edebiyata kurdî ya klasîk du unsûrên bingehîn hene. Yek ji wan destpêka wê ye. Li gorî her lehçeyeke kurdî destpêkeke têkûz mijareke girîng e. Lêgerîn di vê biwarê da berdewam in. Ya duyem jî li gor serdeمان dabeşkirina edebiyatê ye. Divê ev herdu diyarde ronî bibin, ta di nava vê edebiyatê da guman nemînin û lêkoler bi hêsanî bikaribin li ser naveroka wê xebatan bikin.

Destpêkeke teqez bo Edebîyata kurdî ya klasîk ta îro nehatîye selmandin. Roj bi roj berhemên nû derdikevin û lêkoler bi çavekî tarîxî jî li wan berheman dînihîrin, ka gelo bo destpêka edebîyata kurdî tiştekî nû heye yan na. Bi rastî dîtina materyalîn nû yên vê biwarê, kelecanekê jî dide meriv. Bidestxistina berhemên nû bo dîyarkirina sînorêن vê edebiyatê jî pir girîng in. Bi dîtina her berhemekê, helbestekê hetta malikekê, hem kewara edebîyata kurdî ya klasîk tê dagirtin hem jî bo dûvçûn û biryarêن rîkûpêk, fersend dikevine destê me. Lê her çawa be, gotina dawî ango biryara zexim heta niha nehatîye dayîn û bi re'ya me bo biryarên teqez hê jî zû ye. Loma tiştêن ku dikevin ber destên lêkoleran, eger tiştên pir nû bin û qabilî dîrokguherînê bin, wê çaxê meriv dikare bêje *'li gorî tesbîten me, heta niha ya herî kevn ev e. Yan; berî vêya heta niha tu hel-best, dîwan, mesnewî... nehatîye dîtin. Yan; heta ku yeke kevintir were dîtin divê ev weke ya pêşîn ango weke destpêk were pejirandin û h.w.d.'* Divê ji bo îhtiyadê şerhek were danîn. Loma çawa ku tê zanîn, qada edebîyata kurdî ya klasîk, ji layê alav û pirlehçeyî û erdnîgariyê va belawela ye. Loma xebatên vê qadê hem hêdî dimeşin û hem jî bi zehmetî berdewam dibin.

Tevî ku hin lêkoler, edebiyata kurdî, li gor sedsalan dabeşî serdeman dikin jî, hêja ye ku meriv bipirse ka gelo krîterên vê dabeşiyê ci ne? Ew berhemên ku weke klasîk têñ binavkirin, ka gelo bi rastî jî klasîk in an na? Edebiyata klasîk a kurdî, bi muslimbûna kurdan dest pê dike yan na?³ Bivênevê ev pirs, hemû muhtacê bersivan in. Bi derbasbûna demê, bi dîtina belgeyêñ nû re û bi xabetêñ zanistî yên vê qadê re, pêderpey wê ev pirsêñ jor bersivêñ xwe bi dest bixin.

Di rastiyê da nivîsara me, mijara du gotaran di xwe da dihewîne. Ji ber ku herdu mijar pihêt bi hev va gîrêdayî ne, me herdu di gotarekê da civand. Herdu mijar jî bi dîtina helbesteke nû ya kurmancî re ‘eleqedar e. Ango dîtîna helbesta *Hemîdî* bi kevinbûna xwe, dikare destpêka dîroka edebiyata kurdî biguherîne. Heman helbest ji ber ku ji aliyê şîklî va mulemme'e, guherîneke din jî di vê cureyê da pêk tîne.⁴ Loma destpêkeke nû bo edebiyata klasîk a kurdî û bo mulemme' û medhiyeyêñ kurdî bi hev ra ketin nava vê gotarê. Ji ber vê yekê em ê li ser du besêñ bingehîn gotarê dabeş bikin û binbesêñ wan jî li gorî vê dabeşkirinê parve bikin.

Gotara me li ser berawirdiya mulemme'an, kalîteya wan, bandora wan, hûrgiliyêñ taybetiyêñ wan nasekine. Gotara me bi peydabûna helbesteke nû û tarîxkevin, angaşt dike ku destpêka edebiyata kurdî ber bi guherînekê va diçê û herwiha mulemme'a kurdî jî guherîneke balkêş bi dest dixe. Helbet ev angaşt bi peydabûna hin keşkol, dîwan û mecmu'eyêñ kurdî yên nû dikare bê guherîn û şî'rêñ hîn kevintir bê bi dest xistin. Di vî warî da xebatêñ lêkoleran berdewam in.

1. HEMÎDÎ Û DESTPÊKEKE NÛ BO EDEBIYATA KURDÎ YA KLASÎK

1.1. Destpêka Şitlên Şî'ra Kurmancî û Nêvenga Hevotina Şa'îrên Klasîk

Şî'ra klasîk a kurdî şî'ra çand, bawerî û zanînê ye. Ev tradisyon encama da-neheveke mezin e. Şa'îrên vê kevneşopîyê berî ku dest bi nivîsîna şî're bikin, fêrî vê tradisyonê dibin, şâ'îrên berî xwe dixwînin. Jî danehev û mehsûlên berî xwe qenc haydar dibin û wekî hewesekê na, bes karekî cidî dest bi nivîsînê dikin. Helbet fêrbûna 'erebî û farisî jî ji bo şâ'îrên kurd karekî girîng e û ev hînbûna van zimanan jî parçeyek jî pedegojiya vê tradisyonê ye. Şa'îrên vê tradisyonê di perwerdeya şâ'irtiyê da, bi xwendin, têgîhiştin û jiberkirina helbesten berî xwe dest bi kar dikirin.⁵ Pişti van karan, şâ'iran dest bi reşbelekên xwe dikirin. Helbet di vê êwrê da heweskar û helbestkar jî hev diqetîyan. Ên ku ji bo hewesekê dest bi şî'ran dikirin, di demeke kurt da jê dûr diketin. Yên ku berdewam diki-

3 Ayhan Meretowar, “Sînorêñ Edebiyata Kurdî Ya Klasîk”, *Nûpelda*, Wan 2015, j. 20, r. 48.

4 Hem di cûreyêñ nezmê da û hem di teşeyêñ nezmê da: lewra ev helbesta Hemîdî, hem mulemme'e û hem medhiye ye.

5 Ömer Faruk Akün, “Divan Edebiyatı” *TDV Islam Ansiklopedisi*, C. 9, İstanbul 1994, r. 413.

rin, pêşve diçûn û şarezatiya wan berbelav dibû. Meriv dikare bibêje îro jî rewşa helbestkariyê ‘eynî ye.

Vêca dema ku em behsa despêka şî’ra kurmancî dikan; ‘ka ji bo cara yekem kengî û li ku hatîye nivîsin’ dipirsin û sohbet tê ser nifşê yekem ê wan şâ’irên kurmanc ên ku berhemên wan gîhîştine me. Ew jî nifşê ‘Elîyê Herîrî û Melayê Cizîrî û Feqîyê Teyran e. Ev hersê şâ’ir jî şareza ne di honandina helbestên xwe de û gelek serkeftî ne. Vêca pirsek tête heşê meriv: ‘Gelo tiştekî ber’eql e roja ku şî’ra kurmancî peyda bû ew li wê asta bilind be ya ku şî’ra Mela xwe pê gîhandîye?

Di bersîvê da gelek caran em dibêjîn, pêdivî heye berî peydabûna vê nifşâ mezin a şâ’iran, hinek şâ’irên din hebin, şî’r bi kurmancî nivîsîbin û şî’ra wan hêdî hêdî werar kiribe heta gîhandibe vê pileya bilind a em li nik Melayê Cizîrî û serdema wî dibînîn û ev gotina nezerî/teorîk a em dibêjîn hinek caran bi rengekî ‘emelî/pratîk jî delîl li ser peyda dibin, jêderên dîrokî car car hinek na-van didine me em pê dizanîn ku rastîyek bo vê gotina me ya borî heye. Belê berî helbestvanên serdema Melayê Cizîrî jî helbestvanên kurmancînûs hebûne, şî’r û dîwan bi kurdî nivîsîne, eger ci heta niha tu berhemê wan negehiştibe me jî.

Wek nimûne di berhema Şerefxanê Bidlîsî da dibînîn dema ew behsa Mîr Ye’qûbê Begê kurê Mihemed Begê Zerqî yan Zerkî dike, dibêje: “Wî selîqeyeka ‘ecêb di vehandina şî’ran da hebû û wî komek şî’r di babetê tewhîdê de nivîsandîye. Pirêن şî’rên wî bi kurdî ne, heta dîwanike wî heye.” Ev mîr hevçaxê sultanê Osmanî Silêmanê Qanûnî bû û ew di sala 1542an da, li şûna birayê xwe Şahqulî bûye hakimê Zerqê li devera Mêrdînê û nêzîkî 25 salan hukum kiriye. Paşê, wî kurê xwe Dûman li cihê xwe danîye û piştî hingê bi sê salan, yanî li dora salêن 1569an wefat kiriye.⁶

Di hinek cihêن dî de jî Şerefxanê Bidlîsî işaretê dide li sedsala şanzdehan û belkî berî hingê jî, hinek şâ’ir hebûn şî’rên xwe bi zimanê xelkê vedihonandin û xelkê şî’rên wan ji ber dikirin û li hilkeftinan digotin. Yanî guman tê de nîne ku berî nifşâ Melayê Cizîrî şâ’ir hebûne ku şî’rên xwe bi kurmancî nivîsîne. Lî mixabin çu berhemên vê qonaxê hêj negehiştîye me. Loma herdem me digot: “Em nizanin kanê rojek dê were ku em hinek ji wan berheman bibînin? Belê bizav û duwîçûn û lêkolînên vekolerên me yên berdewam û dîtina wan bo hinek keşkol û destnivîsên kevn ên hêj di pirtûkxaneyên taybet û giştî de veşartî mane û peydakirina wan bo hinek durr û mirwarîyên pêşîyan, hêvî û umîdê li nik me peyda dike ku dîtina hinek ji wan berhemên behs jê hate kîrin, karekî hêsa nîne. Loma em dikarin bo şâ’irên me yên kevn û heta niha nehatine zanîn bibêjin; şâ’irên qonaxa berze, ango wendabûyî.

6 Şerefxanê Bedlisî, *Şerefname*, (Wergêran Bo ‘Erebî: Mihemed Cemîl Rojbiyanî), Çapa 2., Erbil 2001, r. 415-416.

1.2. Şa'îrekî Qonaxa Berze û Serhatiya Peydakirina Şî'ra wî: Mela Mehmûd

Yek ji şa'îrên qonaxa berze ji dîroka edebîyata kurmancî ku heta demeke nêzîk kesî hay jê nebû û kesî nedizanî ku wî berhemeye kurmancî heye, şa'îrê Badînî *Mela Mehmûd* e. Nasnavê wî yê helbestê *Hemîdî* ye. Derbarê vî nivîskarî da xebatênu ku heta niha hatine kirin û tespîtêna hatine kirin bi vî awayîne;

a. Serhatiya peydabûna wî digihîje sala 1998. Wexta ku Prof. Mes'ûd Kitanî⁷ nivîsarek li dor hinek şî'r û şa'îrên kevn di hijmara 6ê da, di kovara Peyv da, ya li Dihokê derdiket belav kir û di nivîsîna xwe da şî'rek ji destnîseke kevn veguhast û bi wê niyetê belav kir ku ew şî'reke Mela Husênenê Bateyî ye. Dema ku Kitanî ev şî'r bi vê niyetê belav kir, li ser hizra wî nebû ku ew şî'r ya şai'rekî dî ye û gelek berî Bateyî jiyaye, belkî berî nifşê Melayê Cizîrî jî jiyaye û kesê ev çende aşkera kirî Se'îd Dêreşî bû.

b. Se'îd Dêreşî⁸ ew di nivîseke xwe da, di hijmara yekem a kovara Dîrokê da, sala 2013an weşandibû, lêkolîn li ser vê şî'rê kiribû û dabû aşkerakirin ku ev şî'r a şâ'irekî kevn ê Badînî ye, sedsala şazdê zayînî jiyaye û hevçaxê mîrê Amêdîyê yê navdar Sultan Husênenê Welî ye û nasnavê wî yê şî'rî Hemîdî ye.

c. Tişta ku mamoste Se'îd Dêreşî ji bîr kiribû ku destnîşan bike, ev e ku navê vî şâ'irî yê rast Mehmûd e, wekî ew bi xwe di malikeke helbesta xwe da dibêje:

“*Mehmûdo xweş tişt e ‘ilm xasme ji bo xelqê mela*”

Wekî em dibînîn şâ'ir di vê malikê da gazî xwe bi xwe dike û dibêje: “Ey Mehmûd, ‘ilm tiştekî xweş e bo hemî kesan, bi taybet bo mirovê wekî te mela be.”

Nasixê destnîsê li pêşîya şî'rê ev gotina farisî nivîsiye, dibêje: “*Der sifetê dîwanê Sultan Huseyn ez goftarê Hemîdî*, yanî: *Ji gotina Hemîdî di der heqê sifetên dîwana Sultan Husênenî da*”. Ji vê gotina wî tête famkirin ku xwediyê vê şî'rê Hemîdî ye û mijara şî'ra wî li dor medh û wesfîn koşk û dîwana Sultan Husênenî ye.

7 Mes'ûd Kitanî: Navê Mes'ûd Hacî Baba Mistefa Kitanî ye. Di sala 1933an da li Amêdîyê hatiye dunyayê. Di 2017an da wefat kiriye. Ronakbîr, nivîskar, helbestvan û folklorhezê kurd bû. Ji 50 zêdetir berhemên wî hene, derbarê dîrok, wêje, zanistên sirûstî û hwd da. (Bnr: https://ku.wikipedia.org/wiki/Mesûd_Kitanî: (pêgehîn: 01.03.2019.)

8 Se'îd Dêreşî: Di sala 1958an li gundê Dêreşê hatiye dunyayê ku dikeve nav tixubê qezaya Amêdîyê ku Amêdîyê jî di berê da paytexta mîrgeha Badînî bû. Niha jî bajarokê Amêdîyê di tuxubê parêzgeha Dihokê da ye. Ji sala 1995an û vir va li Elmanayayê dijî. Gelek xebat û berhemên wî yê li ser dîrok û edebiyata kurdî hatine weşandin. Bnr. Dîwana Wedaî (Amd. Seîd Dêreşî), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

1.3. Sultan Husênê Welî

Sultan Husênê Welî ew sultanê xwedîyê koşka mîrê navdar ê Amêdî ye. Ew di sala 1533yan ê mîladî da piştî mirina bavê xwe Hesen Begê bûye mîrê Amêdîyê û sîh salan heta mirina xwe sala 1573an hukum li devera Badînan kirîye û ji kitêb û jêderên dîrokê xuya dibe ku ev mîrê Badînan kesekî bi hukum bû û li hinek demên hukmê wî ew deverên herêma mîrnişîna wî jî ketibû bin destê wî û belkî ji ber vê çendê bit wî nasnavê sultan wergirtibe. Herwiha diyar e ew mirovelkî camêr û dîndar bûye lewra jê re digotin Sultan Husênê Welî. Sultan Husênê Welî gelek karêن hêja di demê hukumraniya xwe de kirine û karê wî yê ji hemiya berçavtir avakirin an nûjenkirina Medreseya Quba bû, ya bi sedan salan wek zanîngeheke mezin bû li wê deverê û hijmareke mezin a zana û edîban ders lê xwendîbûn û ders dabûn.⁹

Diyar e, Sultan Husênî koşkeke ava û xweş li Amêdîyê hebûye, gelek zana û edîb û maqûl lê kom dibûn û yet ji wan *Mela Mehmûdê* şâ'ir bi xwe bûye û wek wefadariyekê bo vê koşkê û xudanê wê, xwestiye ku şî'rekê di wesfê koşkê da birêse. Ew şî'r jî ev şî'r e ku ev nivîsar li ser wê hatiye avakirin.

Ji naveroka şî'rê tête zanîn ku dema *Hemîdî* ev şî'ra xwe nivîsandîye Sultan Husêن hêj li heyatê bûye. Lewra ew, du'ayê bo wî dike ku koşka wî her û her ava bimîne. Lewra me berê jî gotibû ku Sultan Husêن di sala 1573 de miribû. Vêca divê em bibêjîn dîroka vehandina vê şî'rê berî vê salê ye. Wate: *Mela Mehmûdê Hemîdî* hevçaxê mîr Ye'qûbê Zerqî bû û berî Melayê Cizîrî bû.

1.4. Şî'ra Mulemme'î ya Hemîdî ji Aliyê Şikl û Naverokê ve

Ev şî'ra Hemîdî ji aliyê teşeyê ve qesîde ye û di eslê xwe de ji 28 malikan pêk tê. Lê ji ber ku malikeke 'erebî ketîye, li ber destê me 27 malik hene. Ji aliyê ruxsarî ve li ser behra remelê hatiye nivîsandin. Wezna wê bi vî rengî ye: *fa'ilatun/fa'ilatun/fa'ilatun fa'ilun*. Şî'r ji çar zimanan pêk tê: kurdîya kurmancî û türkiya osmanî, farîsi û 'erebî. Xuya ye ku Hemîdî di van her çar zimanan da şareza bûye. Hêjayê gotinê ye, ku piştî *Hemîdî* nêzîkî sed û pêncî salî Ehmedê Xanî jî hatîye û helbestek bi van her çar zimanan vehandîye. Piştî Xanî jî bi taybet li binê bandora Xanî mulemme'én kurdî hatine nivîsandin.

Ji layê naverokê ve ev şî'r -weki ku me li jorê behs jê kiribû- li dor saloxetê koşka Sultan Husênê Welî ye û tiştê balkêş ew e ku, şâ'ir li cihekî du'ayê bo mîrê Amêdîyê dike ku kurd hemî bo wî bibine silavkêş û li pêş wî rawestin. Anglo *Hemîdî* dixwaze ku Kurd hemî bikevine bin xizmeta wî û xwe li ber wî biçemînin.

9 Dîrokvan Dr. 'Îmad 'Ebdusselam Reûfi kitêbek bi zimanê 'erebî li dor jîn û karên Siltan Husênê Welî nivîsiye û ew li sala 2009an li Hewlîrê hatiye weşandin. Di wê kitêbê de ew bi berfirehî behsa vî mîrî û serûberê devera Badînan a li serdema wî dike. (bnr. 'Îmad 'Ebdusselam Reûfi, *Es'-sultan Huseyn el- Welî, Emîr-î Behdînan*, Hewlîr 2009.)

Helbet mijarêن helbestê tenê medhê koşka Sultan Hesenê Welî nîne. Hemîdî ji serî heta malika hijdehem behsa bihar û siruştê dike. Herwekî bihariyeyê ye. Malika 19an a texellusê ye. Ango li gorî dabeşîya qesîdeyê ji nesîbê derbasî medhîyeyê dibe. Ev jî tê vê wateyê ku Hemîdî gelek baş hay ji teşeyên nezmê yên berî xwe hebûye û ev pîvanêن qesîdeyê bi hostetî di vê helbesta xwe da bi kar anîye. Ji malika 20 heta malika 23 pesnê Sultan Hesenê Welî dide. Ji wî rê dua-yan dike. Çar malikêن dawî dikevin beşa fexrîyyeyê ku *Hemîdî* pesnê xwe dide.

Li vê derê divê ku em vê şî'rê hemî li ber çavêن xwendevan û lêkoleran day-nin. Her çend ev metnê ku me latînize kir, ji kêmâsiyan vala nîne. Lewra me yekser ji destnivîsa resen wernegirtiye. Belkî me ew ji daneya çapkîrî ya *Kitanî* û *Dêreşî* wergirtiye û *Dêreşî* bi xwe jî ew ji ya *Kitanî* wergirtiye. Yanî destnivîs ne li cem me ye û ne jî li cem Dêreşî hebûye ku em lê bizivirin û cihêngumana tekîd bikin. Di helbestê da malikên kurdî û 'erebî çendekê ji yên osmanî û farisî bastır hatine hûnandin.

2. MULEMME'

2.1. Mulemme' û Destpêka wê

Bêguman dema millet têkelî hev dibin, pir tiştan ji hev werdigirin, pirlayane dikevin bin bandora hev. Ev tiştekî asayı ye. Kurd piştî misilmanbûnê, ji aliyê çand, huner û ayînî ve ji ber ku zimanê dînê îslamê yê resen bû, ketin bin bandora 'erebî. Medreseyêن li Kurdistanê vebûn bi vî zimanî meşyan. Ders û mufredat û materyal ekserî bi 'erebî bûn. Ev jî bû deriyek ku kurd di 'erebî de mahir bibin, bi hezaran cild pirtûkên 'erebî binivîsin, bixwînin û bidin xwendin. Lewra zimanê 'ilm û zanînê ew bû, herwiha zimanê Dînê Îslamê (Qur'an- hedîs) jî 'erebî bû. Ev bandor ne tenê bo kurdan, herwiha bo faris û tirkan jî di heman raddeyê de bû. Farisî jî piştî erebî weke zimanê edeb û helbestê dihate zanîn û ew jî piştî 'erebî weke zimanê duyem di nava zanayanê kurd da belav dibû, gelek edîbêñ kurd bi vî zimanî berhem dianîn wicûdê. Tirkî jî ji ber ku zimanê dewleteke serdest bû ku kurd di nava sînorêñ wê dewletê da dijîyan, bivênevê dihate eliminandin û 'emilandin. Vêca mulemme' qadeke helbestê ye ku şâ'ir bi gelek zimanana govenda peyvan digerînin.

Mulemme' di ferdîngan da di wateya; rewşen kirin, perçeyên xwedî rengê cuda, rengorengo, ajalêñ li ser çermê wan lekeyên ne ji rengê postê wan heye da ye¹⁰. Wateya wê ya edebî; "helbesta ku bi çend zimanana hatiye niví sandin" e.¹¹

10 <https://www.almaany.com/ar/dict/ar-ar/%D9%85%D9%84%D9%85%D8%B9/> (pêgehîn: 24/06/2019); (<http://www.vajehyab.com/moein/%D9%85%D9%84%D9%85%D8%B9>) (pêgehîn: 24/06/2019)

11 Salahaddin Bekki, "Aşık Tarzı Şiir Geleneğinde Mülemma", *I. Uluslararası Aşık Sümmani ve Aşıklık Geleneği Sempozyumu Bildirileri*, Birleşik Yayıncılık, Ankara 2012, r. 485.

Eger şî'r bi şêweya mulemme'ê hatibe nivîsîn û xezel be, ji wê re xezela mulemme', bi teşeya *murebbe'* be, *murebbe'a mulemme'* tê gotin.¹² Helbestvanan bi vî şiklî xwestine ku hunera xwe nîşan bidin.¹³ Di vê hunerê da du ziman, sê ziman, çar ziman û hetta 6-7 ziman jî dikare bikeve nava helbestekê.

Wek kevneşopiyeke edebî, di edebiyata miletên misilman da em rastî mulemme'an têñ. Di van cûre helbestan de her komerêzeke helbestê, ji çend zimanêñ cihê cihê pêk tê. Çawa ku şairên ereb, di yekeyên nezmî yên beytên helbestên xwe yên mulemme'î de, di rêza serê ewil de cih dane zimanê xwe, peyra jî cih dane zimanê din; şairên faris û tirk jî bi vê terzê helbestên xwe hûnane. Îca gava meriv li mulemme'én kurmancî û kirmancî dînihîrin, ne bi temamî be jî wan, di rêzên yekeyên nezmî yên helbestên xwe da serê ewil, bi dorê cih daye zimanê erebî, peyra farisi, peyra tirkî û peyra jî wan cih daye zimanê xwe.

Di edebiyata erebî da nimûneyên pêşîn ên vî cureyî, ji layê kesên neereb ve hatine nivîsîn. Paşê hin şairên ereb jî mulemme'én du zimanî nivîsandine.¹⁴ Li nav farisan ev cure helbest di sedsala 10an da ji layê ebu'l Hesen Şehîd bin Hesen Belxî ve hatiye nivîsandin¹⁵. Ebû Cafer Endabî jî di vê sedsalê da mulleme' nivîsiye. Piştî wan, Se'dî, Mewlana, Hafiz û gelekên din di vê cureyê da hunera xwe nîşan dane.¹⁶ Di edebiyata tirkî da baş nayê zanîn ka ev cure bi kê dest pê dike lê di vê edebiyatê da mulemme' bêtir bi du û sê zimanan (erebi-tirkî-farsi) hatine nivîsîn.¹⁷

Kayê Şewqê û Kelawi⁷⁰, çar perde yo. Ino kay di tada u zulmê şewqe ra behs esto. Çi wext Cumhuriyet ‘ilon bena, zaf qanuni u me’meleyi vuriyeni u pê hişê Ruecawayi newe ra nusiyeni. Zaf çi weradiyeni u qedex beni. Ini çiyan ra yo zi Qanunê şewqe yo. O wext komi ina qebul nêkerdên, şaşika xu nêvetên u şewqê nênen sareyê xu ser ya wi dalıqnên ya zi eştên hepis. Ino kay, ino zulim ra behs keno.

3.3.3.7. Kaê Khirte: Ino kay Gül Kapar, şenayıyê Ruecê Ziwanê Dayiki inê tarixê 21 Sıbat 2016 nuşta u idare kerda. Seba ino kay Gül Kapar hina melumat dona:

66 <https://hesrete.wordpress.com/biyografi/>, 29.05.2018

67 <http://www.basnews.com/index.php/tr/culture-arts/371543>, 29.05.2018; Ferhat Pak, “Nuştoğ İlhami Sertkaya’dı Reportac”, Çime, Serr 3, Umar, Payız 2007, r. 14-17.

68 Asmêno Bêwayir, “İlhami Sertkaya de Mobet”, Miraz, Serre: 1, Umar: 2, Sıbat 2007

69 Nazım Kalkan, *Tiyatronun Gelişimi-Zazaca Tiyatro ve Bir Zazaca Tiyatro Denemesi*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü (Yayınlanmamış) Tezsiz Yüksek Lisans Projesi, Eylül 2014, r. 12-28.

70 Nazmî Kalkan, “Şewqe u Kılaw”, Vir Edebiyat u Folklor, Serr: 1, Omar: 1, 2016, r. 67-73.

“Ez wazena ita di wa yo tiyatroyê Zaza-Der bibo; çunki mi zerr da ino gure. Ez eşkena ino gure bikeri. Helbet, duayen esti ki pê serran emek dayo. Ez nêwazena wa inan ri hequeret bibo; labelê guereyê mi tay hunermendiya mi esta. Teyna meqsedê mi ez qayil a (ino gure) qey ziwanê xu biwiraz...”⁷¹

3.3.3.8. Rengê Awe: Ino kay, kitabê tiyatroyi ‘Toplu Oyunlar-3’ di ca geno. Nuştoğê ino kayi Cuma Boynukara yo. Ino kitab, Tırkı yo. Roşan Lezgin ino kay, 2010 di Tırkı ra açarnawo Zazaki. Ino kay di 9 sehne yi esti u qehramani yo cini u cumerdi yê. Ini wirdi hişê xu ya komeli ser zêpi niyê. Onayışê meseleyan ser pinêkeni; labelê çi wext ini wirdi zerr koni yobinan u eşq kono bêname famkeni ki eg yo dinyawa newe bivirazı u ġiyal bikeri ê ino problem helkeni.⁷²

PEYNİ

Tiyatro zey huneranê binan merasimanê dini ra biyo, dîma din ra ciya biyo u xuser biyo yo huner. Tiyatro huner ser yo cayê bediliyayış o; çunki yobinon ra ciya insani pê fikiranê tewiran peyni di tesirê tiyatroyi ser yo qey raşt yeni yoca.

İlmê tiyatroyi, ilmê cuya yo u hunerê komel o. Çimeyê heyati tumatim aver-şıyayış wazeno. Kayê tiyatroyi di beynatê kaykeran u temasakeran di yo dayış u guretiş esto. Tiyatro, zerreyê ino dayış u guretiş di hem kaykeran hem zi temâsakerani xu geno beno resneno rindiyânê ruhi u evrenselan.

Tiyatro, hina yo huner o pa cuyayê insani yo şeklêko eceib di averşino. Seba inay tiyatro qey cuyayê, ziwanê dayika, baweriyyê u fomkerdişê insani yo gureyo erca yo. İnsan, seni her ruec newe ra destpêkeno heyatê xu hina zi eşkeno her wext newe ra destpêbikero tiyatroyi. Seni cuya di tepiya agerayış çin o, tiyatro di zi tepiya agerayış nêbeno.

Tiyatro, teyna hetê politika, iqtisadi u komeli ra cuya ser yo tesir viraştiş nêyo; eyni wext di tiyatro gonibiyayışê yo ziwan o, pêserkerdişê tecrubeyanê şaran o. Tiyatro, inan hemin piya cayê xu ra leqneno u komel aver beno.

Tiyatro, hina yo huner o hem keyfweşi dono insani hem zi insan musneno; hem insan huyeneno hem zi fikrneno. Seba may tiyatro, xeyal ra vet yo dinya dono insani.

Tiyatro di zey ‘dehkera, temsil u insan’ çend unsuri bînin esti. Ini zi pê ziwan beni. Ino heyat pê insan u insan zi pê heyat esto. Wirdi zi bê ziwan kêm moneni; çunki insani yobinan di pê wesitayê ziwanî beni şinası, pikeni u heyat keni ava.

Musayışê u musnayışê ziwanî zaf teknik u metodi tewîrin esti. Musayışê u musnayışê ziwanî di muhim a ya insan rayira raşt bizonu u tesbit bikero. Tiyatro

71 zazader.org/wp-content/uploads/2018/01/2017FALİYET-RAPORU.pdf, 31.05.2018

72 Cuma Boynukara (Tırkı ra çarnayox: Roşan Lezgîn), *Toplu Oyunlar – 3*, Mitos Boyut Tiyatro Yayıncılıarı, İstanbul 2002, r. 25-60

zi musayışê u musnayışê ziwanî di yo cayo muhim geno. Ziwanê dayiki insan di yo qîşêkerdişo weş u raşt muhim o, yena zonayış tiyatro, şixuliyayışê ziwan di zaf tesirin o ziwan aver beno.

Edebiyatê Zazaki, wareyê Edebiyatê nuşteki di hema newe yo; ino rîd ra xebatanê tiyatro di zi ina neweyi esta. Yo ziwanî ki zey Zazaki hîni ho beno vin qey xelasîya ino ziwanî, tiyatro muhim o. Ma zi seba inay ina xebatê xu di edebiyatê Zazaki di tiyatro ra behs kerd.

ÇIMEYİ

And, Metin, *Başlangıçından 1983'e Türk Tiyatro Tarihi*, İletişim Yayıncıları, İstanbul 2012.

Bayal, Metin, "Tiyatronun Doğuşu Üzerine Bir Model Önerisi", *Tiyatro Eleştirmenliği ve Dramaturji Bölüm Dergisi*, Serr: 2012 C. 0, H. 12, r. 71-97, <http://dergipark.gov.tr/teddergi/issue/18482/194621, 05.06.2018>

Baran, Lokman, "Çağdaş Uygur Edebiyatının Oluşması ve Gelişmesi", *Bılıg Türk Dünyası Sosyal Bilimler Dergisi*, Ahmet Yesevi Üniversitesi, Serr: 2007, H. 42, r. 191-211.

Bêwayir, Asmêno, "İlhamî Sertkayê de Mabet", *Miraz*, Serre: 1, Umar: 2, Sıbat 2007

Boynukara, Cuma, *Toplu Oyunlar – 3* (Tirkî ra çarnayox: Roşan Lezgîn), Mitos Boyut Tiyatro Yayıncıları, İstanbul 2002, r. 25-60

Çağlayan, Hüseyin, *Ema Lenge (Eşq u Dez)*, Belge Yayıncıları, İstanbul, 2017.

Çalışlar, Aziz, *Tiyatro Ansiklopedisi*, Kültür Bakanlığı Yayıncıları, Ankara 1995.

Çetili, İsmail, *Metin Tahillerine Giriş 2- Hikâye, Roman, Tiyatro*, Akçağ Yayıncıları, Ankara 2009.

Dehqan, Mustafa, "Diyarbakır'dan bir Zazaca Alevi Metni" (Çeviren: Fahri Pamukçu), http://zazaki.de/turkce/makaleler/Dehqan-Diyarbakirdan_birzazaca_alevimetni.pdf, tarixê resayı: 11.03.2019

Devellioğlu, Ferit, *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lugat*, Aydin Kitabevi, Ankara 2013.

Gruba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Kîrmançî (Zazakî)-Tirkî Kîrmancca (Zazaca)-Türkçe Sözlük*, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul 2009.

Hayig Roşan ve Werner Brigitte, *Zazaca Türkçe Sözlük / Türkçe Zazaca Sözcük Listesi*, Tij Yayıncılık, İstanbul 2012.

Kalkan, Nazım, *Tiyatronun Gelişimi-Zazaca Tiyatro ve Bir Zazaca Tiyatro Denemesi*, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü (Yayınlanmamış) Tezsiz Yüksek Lisans Projesi, Eylül 2014, r. 12-28.

- Kalkan, Nazmî, “Şewqe u Kilaw”, *Vir Edebîyat u Folklor*, Serr: 1, Omar: 1, 2016, r. 67-73.
- Karaömerlioğlu, Leyla, “Okul Öncesi Eğitimde Doğaçlama”, *Çukurova Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Sahne Sanatları Anasanal Dali Yüksek Lisans Tezi*, Adana 2010, r. 25. <http://library.cu.edu.tr/tezler/7709.pdf>, 27.05.2018
- Kavruk, Hasan ve Salman, Ramazan, Türk Dili Yazılı ve Sözlü Anlatım, Yılmaz Matbaacılık ve Yayıncılık, Malatya 2016.
- Kişioğlu, Veli, “Zazaca Tiyatro Üzerine”, *Tarihsel ve Sosyolojik Gelişimi İli Zazaca Tarih Edebiyat Coğrafya Folklor*, Kalan Yayıncıları, Tunceli 2019.
- Kurij, Seyîdxan, Zazalar ve Zazaca Yazını, <http://www.zazaki.net/haber/zazalar-vezazaca-yazini--781.htm>, 27.05.2018.
- Love, Circle, Dünya Tiyatro Tarihi ve Tarihsel Gelişimi, <https://circlelove.co/dunya-tiyatro-tarihi/> 05.06.2018
- Mirza, Yismayil, *Ferhat eve Şirin ra*, Ceylan Matbaacılık, İstanbul 2018.
- Mirza, Yismayil, *Sur u Çequer*, Ceylan Matbaacılık, İstanbul 2018.
- Nutku, Özdemir, *Dram Sanatı Tiyatroya Giriş*, Kabalcı Yayınevi, İstanbul 2001.
- Pak, Ferhat, “Nuştoğ İlhamı Sertkayê’dı Reportac”, *Çime*, Serr 3, Umar, Payız 2007, r. 14-17.
- Sevinçgül, Ömer, *Gizli Saklı Mevzular-2: Efsanevi Varlıklar ve Görünmeyen Yaratıklar*, Nesil Yayınları, İstanbul 2016.
- Sina, Ayşen, “Eskiçağda Atina’da Şenlikler”, *Adnan Menderes Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Yıl: 2, H. 1, r. 42-59.
- Söylemez, İsmail, “Geçmişten Günümüze Zazaca Dergiler: Kronoloji, Sorunlar ve Çözümler”, I. *Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, s. 175-191.
- Taner Haldun ve Nutku Özdemir ve And Metin, *Tiyatro Terimleri Sözlüğü*, Ankara Üniversitesi Basımevi 1966.
- Tecer, Ahmet Kutsi, “Orta Oyunu Tiyatrodur”, *İstanbul Dergisi*, C. 2, H. 5, Mart 1995.
- Varol, Murat, “UNESCO’nın Dil Raporlarına Göre Zazaca’nın Durumu ve Geleceği”, *Turkish Studies International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 10/2, Winter 2015, s. 997-1006
- Yıldız, Pelin, “Sahne ve Seyirci Etkileşiminin Tarihsel Gelişiminde Gösterebilimsel Açıdan Bir Analiz”, *Selçuk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Serr: 2005, C. 13, r. 426-442.
- Zenderlioglu, Berfin ve Metin, Mîrza, *Mérdeyê Şewe*, (Kurmanckî ra Çarnayîş: Roşan Lezgîn), Weşanêن Avesta, İstanbul 2011.

Çimeyi Interneti

- <http://dersimnews.com/kultur/kaybedilen-insanlarin-anisina-zazaca-tiyatro.html>,
29.05.2018
- <http://www.basnews.com/index.php/tr/culture-arts/371543>, 29.05.2018;
- <http://www.gencinsesi.com/haber/2626/gencte-tiyatro-senligi.html>, 29.05.2018
- <http://www.kalemsquare.com/2011/11/16-uluslararası-ankara-tiyatro-festivali.html?m=0>, 29.05.2018
- <http://www.siverekhaber.com/metin-gencdal-ilk-ve-ortaokulu-ogrencilerinden-zazaca-tiyatro-oyunu-1265h.htm>, 29.05.2018
- <http://www.solhan.gov.tr/ilçemizde-zazaca-tiyatro-sahnelendi>, 29.05.2018
- <https://hesrete.wordpress.com/biyografi/>, 29.05.2018
- <https://www.haberler.com/diyarbakir-da-zazaca-tiyatro-oyunu-sergilendi-5347119-haberi/>, 29.05.2018
- <http://zazader.org/wp-content/uploads/2018/01/2017FALİYET-RAPORU.pdf>,
31.05.2018
- <http://zazader.org/wp-content/uploads/2018/01/2017FALİYET-RAPORU.pdf>,
31.05.2018

TARÎXU MEYYAFARIQÎN

A ÎBNU'L-EZREQ EL-FARIQÎ Û GIRÎNGÎYA WÊ DI DÎROKA KURDÎN MERWANÎ DE¹

(İbnu'l-Ezreq el-Fariqi's Tarixu Meyyafariqin and Its Importance in the History of Merwani Kurds)

Ahmet Seyari²

Kurte

Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî di sedsala XII'an de jîyaye. Fariqî di serdemâ Artûqîyan de di hin karên rêvebirîya dewletê de cih girtiye. Navê wî Ehmedê kurê Yusuf kurê Elî kurê Ezreq e. Ji ber ku ji Farqînê ye jê re el-Fariqî hatiye gotin. Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî di sala 572/1176an de berhemâ xwe ya bi navê Tarîxu Meyyafariqîn nivîsiye. Du destxetên vê berhemê li Londonê di muzyea Britishê de cih digirin. Tarîxu Meyyafariqîn der heqê dewlet û mîrektilîyên serdemâ navîn ên wekî Hemdanî, Buweyhî, Merwanî, Artûqî, Emewî, Ebasî û Selçûqîyan de agahîyên çandî û siyasî dide. Behsa têkilîyên van mîrnişîn û dewletên ku li Şam, Iraq, Cezîre, Ermenistan û Îranê hatine damezirandin dike. Hem li ser têkilîyên wan ên navxweyî û hem jî yên bi Endulus, Fatîmî û Bîzansîyan re disekine. Di vê gotarê de derbarê Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî, bajar û welatên ku li wan gerîyaye, peywirêne wî yên di rêvebirîya dewletê de, kesayeta wî ya ilmî û berhemên wî de agahî hatine dayîn. Danasîna Tarîxu Meyyafariqîn hatiye kirin û taybetî û girîngîya wê, xebatênu ku li ser hatine kirin, naveroka wê, çavkanîyên wê û rîbaza wê hatine vegotin.

Peyvîn Sereke: Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî, Tarîxu Meyyafariqîn, dîrok, çand, şaristanî.

1 Vê gotarê bingeha xwe ji beşeke teza min a mastirê girtiye. Bnr. Ahmet Eyer, Kurdîn Merwanî di Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq de, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, 2016.

2 Li zanîngeha Bingolê di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de xwendekarê doktorayê ye. (ehmedseyari@gmail.com) ORCID: 0000-0001-2345-6789

Öz

Îbnu'l-Ezrak el-Fariki XII. yüzyılda Artuklular döneminde yaşamış ve bazı devlet kademelerinde görev almıştır. Tam ismi Yusuf bin Elî bin Ezraq'tır. Farkinli olduğundan ona Fariqi denilmiştir. Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî 1176 yılında Tarîxu Meyyafariqîn adlı eserini yazmıştır. Bu eserin iki tane elyazması Londra'nın British müzesinde bulunmaktadır. Tarihu Meyyafarîkin Hamdani, Büveyhi, Mervani Artuklu, Emevi, Abbasi ve Selçuklular gibi devlet ü emirlikler hakkında siyasi ve kültürel bilgiler vermektedir. Şam, Irak, Cezire, Ermenistan ve İran'da kurulan bu emirlik ve devletlerden bahsetmektedir. Bunların birbirleriyle ve Endulus, Bizans ve Fatimiler ile olan ilişkilerini anlatmaktadır. Bu makalede Îbnu'l-Ezrak el-Fariki'nin gezdiği bölge ve şehirler, devlet kademelerindeki görevleri, ilmi kişiliği, eseri hakkında bilgi verilmiştir. Fariki Tarihu Meyyafarîkin adlı eserinde Mervanilerin kültür ve medeniyetleri hakkında çok önemli bilgiler vermektedir. Bu eser siyasi, sosyolojik, mimari, hukuki ve ekonomik açıdan bu dönemin birçok yönünü aydınlatıyor olup bu alanda yapılacak birçok çalışmaya katkı sağlayabilir. Bu çalışmada Mervani Kürtlerinin oluşturdukları ve Tarihu'l-Meyyafarîkin'de yer alan kültür ve medeniyet ele alınmıştır. Bu çerçevede devlet yönetiminde emirlerin özellikleri ve tahta çıkış şekilleri, vezir, vali ve divan işleri hakkında bilgi verilmiştir. Hukuk sistemi ve kadıların özellikleri ve yargılama şekilleri ele alınmıştır. Mervani Kürtlerinin askeri özellikleri ve ordunun kullandığı silahlar hakkında bilgi verilmiştir. Bu döneme ait bina, kalıntı ve mimari eserlere ait bilgiler bu bölümde verilmiştir. Ayrıca bu dönemde yapılmış olan sur, burç, saray, mesire, kubbe, cami ve hastaneler hakkında bilgi verilmiştir. Yanı sıra, Mervani Kürtleri dönemindeki adet, gelenek, görenek ve inanışlar hakkında bilgi verilmiştir. Mervanilerdeki vakıf ve yardımlaşma, ekonomi ve ticari faaliyetler hakkında bilgi verilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî, Tarîxu Meyyafarîkin, Tarih, Mervani Kürtleri

Abstract

Îbnu'l-Ezrak el-Fariki lived in the 12th century Artuqid period and served in some state levels. His full name is Yusuf bin Elî bin Ezraq. Because he was from Farkin, he was called Fariqi. In 1176, he wrote his work Tarîxu Meyyafariqîn. Two manuscripts of this work are found in the British Museum in London. It gives political and cultural information about the state and emirates such as Hamdai, Buveyhi, Marwanis, Artuqids, Omayyads, Abbasids and Seljuks. It tells about these states and emirates established in Damascus, Iraq, Jazeera, Armenia and Iran. It describes their relations with each other

and with the Endulus, the Byzantines and the Fatimans. In this article, the cities and regions Îbnu'l-Ezrak el-Fariki travelled to , his duties in the state levels, his scientific personality and his work are told. In his work called Fariki Tarihu Meyyafarikin, he gives very important information about the culture and civilization of the Marwanis. This work can contribute to many studies in this field by illuminating many aspects of this period in terms of political, sociological, architectural, legal and economic aspects. In this study, the culture and civilization established by the Marwani Kurds in Tarihu'l-Meyyafarikin is analyzed. In this context, information about the characteristics of the amblers in the administration of the state and how they came to the throne and viziers, valis and divan works is given. The legal system, the characteristics of the kadiis and their ways of judging are explained. Information is given on the features of the army of the Marwani Kurds and the special weapons they used. Information about the buildings, remains and architectural works of this period are given in this section. In addition, information is given about the city walls, palaces, promenades, domes, mosques and hospitals built in this period. Besides, information is given on the customs, traditions and beliefs in the period of the Marwani Kurds. Furthermore, information is given about the foundation and cooperation, economy and commercial activities in the Marwanis.

Keywords: Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî, Tarîxu Meyyafariqîn, History, Marwani Kurds.

Destpêk

1. Jîyana Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî

Navê wî Ehmedê kurê Yusuf kurê Elî kurê Ezreq e; lê wekî Îbnu'l-Ezreq el-Fariqî tê nasîn.³ Ji ber ku ji Farqînê⁴ ye jê re el-Fariqî hatiye gotin. Wekî ku Ebû'l-Fîda gotiye carinan ji dawîya peyvan hin tîp kêm dibin. Li vir ji peyva Fariqîn bûye Fariqî.⁵ Agahîyê der heqê jîyana wî de di berhemê wan dîroknaşen din

3 Îbnu'l-Ezraq: *Tarîxu'l-Fariqî*, (Thq. Bedewî Evdilletîf Awad), Qahîre 1959, Teqdîm, r.31.

4 Di sedsalêن 4. 5. ên mîladî de navê wê wekî *Martyropolis* derbas dibe. Pişta ji alîyê Suryanîyan ve wekî *Maipherket* hatiye binavkirin. Pişti ku bi destê Fermandarê artêşa İslâmê Îyazê kurê Xenem hatiye fetihkirin ji alîyê misilmanan ve wekî *Farqîn*, *Mefariqîn*, *Mîfariqîn* an ji *Meyyefâriqîn* û *Mâfârqîn* hatiye binavkirin. (Bnr. Mustafa Alican, Bir Ortaçağ Şehri Olarak Meyyâfârikîn (Silvan), Teza Doktorayê ya Neçapbûyi, Ege Üniversitesi, 2015, r.131-135.) Farqîn demekê di bin hikmê Hemdanî (980-984), Merwanî (984-1085), Selçûqi, Eyubî, İlhanî, Aqqoyînîyan de maye. Di sala 1506an de ketiye bin hukmê Safewîyan û pişti şerê Çildêranê ji ketiye bin hikmê Osmanîyan. (Bnr. <http://www.silvan.gov.tr> 03/07/2016) Niha ev der dikeve navbera bajarê Batman û Amedê û navçeya Amedê ye.

5 Ebû'l-Fîda, *Teqwîmu'l-Buldan*, Daru Sedr, Beyrûd, d.t.r.279.

de derbas nabin. Di gel ku Îbnu'l-Ezreq yek ji dîroknûsên girîng tê hesibandin jî dîroknûsên wekî Îbnî Xelikan, Îbnî Şakir, Yaqût û dîroknûsên din qet qala jînenîgarîya wî nekiriye. Agahîyê der heqê jîyana wî de tenê di berhema wî de derbas dibin. Ev agahî jî di nav berhemê de berbelav in.⁶ Îbnu'l-Ezreq di Tarîxu Meyyafariqînê de dibêje: "Ez di sala 512/1119an de li Meyyafariqînê⁷ çêbûme. Hingê talîhê birca Merîxê nîşan dida."⁸

Ji ber ku ji serê berhema wî hin rûpel kêm in navê wî wekî Îbnu'l-Ezreq li ser berhema wî nayê nivîsîn. Tenê di nava berhemê de navê bapîrê wî Ebu'l-Hesen Reîs Elîyê kurê Ezreq derbas dibe.⁹ Îbnî Şeddad di pirtûka xwe ya bi navê *el-Alaqu'l-Xetîre* de der heqê wî de agahî dane û gotiye: "Navê wî "Ehmedê kurê Yûsuf kurê Elî kurê Ezreq" e û xwedîyê pirtûka *Tarîxu Meyyafariqîn* û *Amed* e.¹⁰

Fariqî di pirtûka xwe de gelek caran behsa bapîrê xwe Ebu'l-Hesen dike. Fariqî der heqê bapîrê xwe de wiha dibêje: "Piştî ku Fexruddewle rêveberîya Merwanîyan xist destê xwe wezîr, Îbnu'l-Enbarî ji girtîgehê derxist û şand cem kalikê min Ebu'l-Hesenê kurê Ezreq ku nazirê Heskîfê bû.¹¹ Piştî ku Fexruddewle gazî bapîrê min kir ew jî ji Heskîfê hat Meyyafariqînê û Fexruddewle hin mal û tiştên biqîmêt danê."¹² Di cihekî din de jî Fariqî wiha behsa bapîrê xwe dike: "Fexruddewle Ebû Elî Belxî bûbû walîyê welatê Merwanîyan lê gel jê gilîdar bû. Li ser vê, lijneyek çû cem sultan ku gilîyê Ebû Elî bikin. Wê demê bapîrê min jî di nav vê lijneyê de bû."¹³ Di cihekî de jî derbarê bapîrê xwe de dibêje: "Piştî ku sultan walîtiya welatê Merwanîyan da Amîduddelewle keleha Erzenê jî de bapîrê min.¹⁴

Îbnu'l-Ezreq di berhema xwe de ji ciwantîya xwe û vir ve hin agahî der heqê jîyana xwe de dane lê qala zaroktîya xwe nekiriye.¹⁵ Lê em ji berhema wî tê digihîjin ku "ew di serdema damezrînerê Artûqîyên Mêrdînê Necmeddin Îlxazî de çêbûye û di serdema rêvebirîya kurê Necmeddin Tîmurtaş û nevîyê wî Necmeddin Alp de jîyaye."¹⁶ Ji agahîyê Fariqî tê famkirin ku ew pir gerîyaye. Bajarê Fars,

6 Awad, h.b., Teqdîm, r.31.

7 Bajarekî di navbera herêma Cezîre û Ermîyanê de ye. Hin, wê ji herêma Ermenîyan û hin ji cezîreyê dihesibînin. Dikeve rojhîlatê Dîjleyê. Ji Amedê pênc fersaxan dûr e. (Bnr. Muhammed bin Evdilmunim Hîmyerî, (Thq. İhsan Ebbas) *Rewdetu'l-Mitar fi Xeberu'l-Eqtar*; Mektebetu'l-Lubnan 1984, r.567.)

8 Fariqî, h.b., r.552.

9 el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.22.

10 H.b., Teqdîm, r.22.

11 Fariqî, h.b., r.522.

12 H.b., r.522.

13 H.b., r.525.

14 H.b., r.527.

15 Awad, h.b., Teqdîm, r.31.

16 Îbnu'l-Ezraq, *Meyyafarîkin ve Amed Tarihi*, (Wer. Ahmet Savran), Atatürk Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi, Erzurum 1990, Teqdîm, h.b., r.10.

Ermenistan, Şam û bajarêن derûdora wê, Cezîreyê û gelek cihêن din ji wan cihan in ku Fariqî li wan gerîyaye. Di vê gera xwe de çûye cem rêvebirê gelek welatan¹⁷ û li van deran karmendîya dewletê jî kiriye.¹⁸

Agahîyêن der heqê mirina Îbnu'l-Ezreq de negihaştine ber destê me.¹⁹ Lê li ser destxeta *Îhya'û Ulûmu'd-Dîn a Xezalî nîşeyeke wî heye ku tê de dibêje*: "Min ev berhem du caran xwendîye. Xwendina min a cara duyem di sala 577/1181ê de ye." Ji vê nivîsê tê famkîrin ku Fariqî heta vê salê sax e.²⁰

1. Bajar û Welatêن ku Fariqî li Wan Gerîyaye

Îbnu'l-Ezreq li gelek bajar û welatan gerîyaye. Wî serpêhatî û nêrînêن xwe yên der heqê van cihan û tîştêن ku li van deran dîtine di Tarîxu Meyyafariqînê de nivîsîne. Li gorî neqla Îbnu'l-Ezreq ew di sala 529/1134an de cara pêşî ji Meyyafariqînê derketiye çûye Mêrdînê. Di sala 531/1136an de jî çûye Cezîreyê û ji wir di ser Nisêbînê re dîsa vegeรiyaye Meyyafariqînê.²¹ Piştra ji wir çûye Amedê û heta dawîya sala 533/1139an li Amedê maye. Di meha zilhiceyê²²de pêşî çûye Mûsilê hinekî li wir maye û di 534/1139an de di meha Rebîulewwelê²³ de çûye Bexdayê û şes mehan li wir maye. Li Bexdayê dema mehra Xelîfe Muqtîfî û Fatma Xatûna keça Sîltan Mihemmed li Babû'l-Hicreyê hatiye birin, Îbnu'l-Ezreq jî li wir e.²⁴ Di nav van gerêن wî de çûyîna wî ya Bexdayê pir girîng e. Lewra bandora gera wî ya li Bexdayê hem li ser zanyarîya wî hem jî li ser bûyerêن ku di pirtûka xwe de nivîsîne heye.²⁵ Lewra Fariqî li Bexdayê gelek alim û zana nas kirine û ji wan ders wergirtiye.²⁶

Fariqî di sala 535/1140î de dîsa vegeرiyaye Meyyafariqînê û ji wir çûye Mêrdînê û demekê li wir maye û paşê ji wir çûye Mûsilê heta sala 546/1151ê li vir maye.²⁷ Ji Mûsilê di ser Xelatê re vegeرiyaye Mêrdînê û heman salê dîsa çûye Bexdayê.²⁸

17 Awad, h.b., Teqdîm, r.32.

18 H.b., Teqdîm, r.35.

19 Savran, h.b., Teqdîm, r.17.

20 A.Hand List of the Arabic MSS, II, 56, Nimreya destxetê: 3376, v.233a. Vgh. Savran, h.b., Teqdîm, r.17.

21 Fariqî, h.b., r.575-577.

22 Di salnameya Koçî de meha 12. (Bnr. <http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri.11/07/2016.>)

23 Di salnameya Koçî de meha 3. (Bnr. <http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri.11/07/2016.>)

24 Fariqî, h.b., r. 534, 580.

25 Awad, h.b., Teqdîm, r.39.

26 H.b., Teqdîm, r.33-34.

27 Savran, h.b., Teqdîm, r.13.

28 Fariqî, h.b., r.580.

Heta serê meha Receba²⁹ sala 547/1152an li Bexdayê maye û ji wir di ser Mûsilê re vegerîyaye Meyyafariqînê.³⁰

Piştî mirina Husameddîn di sala 548/1153yan de Îbnu'l-Ezreq çûye Tiflîsê ketiye xizmeta Dimîtrîyê qralê Exbazê.³¹ Fariqî di rêuwîtiya Dimîtrî de ya ku heftê rojî dom kiriye cih girtiye û bûyerên ku di vê rêuwîtiyê de qewimîne di pirtûka xwe de nivîsîne.³² Di nav van rêuwîtiyê Fariqî de cihekî taybet ê rêuwîtiya wî ya Gurcistanê heye. Lewra di pirtûka xwe de der heqê kevneşopî û pergala vî welatî de gelek agahî dane. Di nav van agahîyan de behsa hin bûyerên ku di navbera qralê Gurcistan û hin hikumdarên misilmanan de derbas bûne, kiriye. Ji ber ku ev agahî di tu berhemên din de derbas nabin pir biqîmet in.³³

Îbnu'l-Ezreq di sala 549/1154an de ji Tiflîsê vegerîyaye û çûye Xelatê. Fariqî vê vegera xwe ya ji Tiflîsê wiha vediguhêze: "Ez ji Xelatê hatim welatê Romê, li vir Nizamedînê kurê Danişmend xwest ku ez li cem wî bimînim lê min ev daxwaza wî nepejirand û ji wir ez di ser Ercîş,³⁴ Bergirî, Newşehir, Qutûr, Xoy Merend, Tebrîz, Zenkan û Nehrê re derbasî Reyê³⁵ bûm û piştra ji çûm Meyyafariqînê."³⁶

Di sala 558/1162yan de dema ku Siltan Arslanşah û hêzên misilmanan ên din Gürçî têk birin, Îbnu'l-Ezreq hatiye Xelatê û ji wir jî çûye Bedlîsê. Fariqî bûyereke wê serdemê ya ku piştî vê serkeftina misilmanan wiha neqîl kiriye: "Piştî vê serkeftînê sê sed dewar hat serjêkirin û goştê wan li feqîran hat belavkirin û Xelat hat xemilandin."³⁷

Îbnu'l-Ezreq di sala 563/1168an de di ser Riha, Minbiç, Heleb³⁸ û Humusê re çûye Şamê.³⁹ Li gorî neqla Fariqî wextê bavê Selahedînê Eyyubî 24ê Cemazîyulewwela⁴⁰ di sala 565/1169an ji Şamê çûye Misrê cem Selahedînê

29 Di salnameya Koçî de meha 7. (Bnr. <http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri.11/07/2016>.)

30 Fariqî, h.b., r.597.

31 H.b., r.600.

32 H.b., r.558.

33 Awad, h.b., Teqdîm, r.41.

34 Bajarekî dîrokî ye, nêzî bajarê Xelatê yê li derdora Ermenîya mezin e. Piraniya gelê wê fileh in. (Bnr. Yaqût el-Hemawî, Mucemu'l-Buldan, Daru Sedr, Beyrûd 1977, C.1, r.144.)

35 Bajarekî navdar e ji bajarên sereke tê hesibandin. Bajarekî bixêrûbêr e û têr mîwê ye. Betlîmos gotiye: Dirêjâhîya Bajarê Reyê heştê û pênc pile ye. (Bnr. Yaqût, h.b., C.3, r.106 – 107.)

36 Fariqî, h.b., r.609.

37 H.b., r.625.

38 Bajarekî gewre ye xwedî xêrûber e, Zûcacî gotiye: Ji ber ku Hz. İbrahîm pezê xwe li vir didot û ew şîr li kesên herêmê digerand. Navê vir bûye Heleb. (Bnr. Yaqût, h.b., C.2, r.282 – 290.)

39 Fariqî, h.b., r.641.

40 Di salnameya Koçî de meha 6. (Bnr. <http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri.11/07/2016>.)

Eyyubî, Fariqî li Şamê ye.⁴¹ Dîsa dema ku Fariqî li Şamê ye di 22yê Şewala sala 565/1170yî de erdhejek li Şam û bajarêñ derûdora wê çêbûye. Îbnu'l-Ezreq di Tarîxu Meyyafariqînê de bi awayekî berfireh qala vê erdhejê kiriye û der heqê wê de agahî dane.⁴² Fariqî di 13ê Cemazîyulewwela sala 566/1170yî de ji Şamê vegevîyaye Meyyafariqînê.⁴³

Îbnu'l-Ezreq di sala 568/1172yan de li Bexdayê ye lewra di vê dîrokê de çûye ser gora helbestvanê navdar Reîs Evdillah el-Huseyinê kurê Heccac.⁴⁴

3. Peywirêñ Fariqî yêñ di Rêvebirîya Dewletan de

Îbnu'l-Ezreq hîn di ciwanîya xwe de dest bi xebata di karê dewletê de kiriye.⁴⁵ Di sala 543/1148an de karê serperiştîya weqfîn derveyê bajarê Meyyafariqînê kiriye.⁴⁶ Pişti vê peywira xwe li Şamê jî rêvebirîya weqfan kiriye. Fariqî wergirtina vê peywira xwe wiha tînê ziman: "Di nîvê meha Şebanê⁴⁷ de ez ji Meyyafariqînê di ser Riha, Minbic, Heleb, Himis û Hemayê re derbas bûm û di hivdehê Remezanê de gihamê Şamê. Li wir ez çûm cem serokê qazîyan Mewla Kemaleddin Îbnu's-Sarezorî û wî nazirtîya vir dîsa⁴⁸ da min û ez li Şamê mam."⁴⁹

Îbnu'l-Ezreq di xizmeta Seîd Husameddin de jî hin kar û peywir anîne cih lewra di sala 542/1147an de Husameddin xwestiye pereyên sıfir çap bike û Îbnu'l-Ezreq ji bo derxistina van pereyan çûye Madenê û jê re sıfir kiriye.⁵⁰

JiNEYNî van peywiran Îbnu'l-Ezreq carinan li cem hin rêvebirîn dewletê cih gitîye û peywirêñ girîng wergirtine. Îbnu'l-Ezreq dibêje: "Ez di sala 544/1149an de li Mûsilîjî bo firotina hesin di xizmeta Husameddin de bûm."⁵¹ Dema Husameddin mir, ez di sala 548/1153yan de li welatê Gurcan ketim xizmeta Melikê Exbaz Dimîtrîye kurê Dawid."⁵²

Pişti ku di navbera Necmeddin Îlxazî û Dimîtrî de Şerê Tiflîsê derketiye Îbnu'l-Ezreq çûye Gurcistanê. Ji gotinêñ wî tê famkirin ku ew pir nêzî Dimîtrî ye û qedr û qîmeta wî li cemê heye. Lewra dema Fariqî û Dimîtrî bi hev re di rîwîtîyekê

41 Fariqî, h.b., r.644.

42 Ji bo agahîyêñ der heqê vê erdhejê de (Bnr. Fariqî, h.b., r.645.)

43 Fariqî, h.b., r.648.

44 H.b., r.594.466.

45 Awad, h.b., Teqdîm, r.31.

46 Fariqî, h.b., r.593.

47 Di salmameya Koçî de meha 8. (Bnr. <http://www.nenedirvikpedi.com/islam/hicri.11/07/2016>)

48 Ji ber bikaranîna vê peyvê *ورد الی*: «li min hat vegerandin» mumkun e ku berî niha jî Fariqî ev peywir li Şamê wergirtibe û ev wergirtin ya cara duyem be. (Bnr. el-Xûlî&Baluken, Tarîxu'l-Meyyafariqîn, Jêrenot: 1, r.641.)

49 Fariqî, h.b., r.641.

50 H.b., r.589.

51 H.b., r.594.

52 Fariqî, h.b., r.600.

de ne û hatine cem keleheke asê Dimîtrî ji Fariqî re gotiye: “Di vê kelehê de leşkerekî Îlxazî heye, here pê re biaxive ka ji ku ye.” Fariqî xistiye dilê xwe ku ji qral bixwaze ku vî leşkerî azad bike. Lê ji ber ku li welatê qral gengeşiyek dest pê kiriye wî serê sibehê bi lezgînî leşkerên xwe rakirine û ji wir çûye. Loma jî Fariqî derfeta dîtina vî kesê girtî bidest nexistiye.⁵³

Li gorî ku Fariqî dibêje Dimîtrî gelek qencî bi misilmanan dikir û qedr û qîmetê dida alim û ehlê tesewifê. Ev qedr û qîmetê ku Dimîtrî dida di navbera misilmanan de jî nehatibû dîtin. Fariqî bûyereke ku taybetîya wî nîşan dide wiha anîye ziman: “Rojeke ìnê Dimîtrî çû mizgeftê û li temamê xutbeyê guhdarî kir û dema derket derve jî ji bo xêra mizgeftê du sed dînar dan.”⁵⁴

Îbnu'l-Ezreq di sala 549/1154an de ji xizmeta Dimîtrî derketiye û çûye Xelatê.⁵⁵ Di sala 567/1166an de jî çûye Meyyafariqînê û dest bi karê serperiştiya weqfîn Meyyafariqînê kiriye.⁵⁶

4. Kesayeta Fariqî ya Ilmî û Berhema Wî

“Îbnu'l-Ezreq di vê pirtûka xwe de di warê dîrok, erdnîgarî, tefsîr û edebîyatê de ji gelek pirtûkan sûd wergirtiye û ji wan agahî veguhestine. Ev jî nîşan dide ku Fariqî xwedî çandeke dewlemend, ilmekî kûr û nêrîneke berfireh e.”⁵⁷

“Piştî salêni ciwanîya xwe Îbnu'l-Ezreq çûye Bexdayê û li wir ilmêni wekî Quran, fiqh, feraîz, zimanzanî, hedîs û tefsîrê xwendine û li dersên gelek zana û mude-risan guhdarî kiriye. Fariqî Quran li cem Şêx Ebû Muhammedê kurê Bintuşêx, Şêx Evdilwehab Hefaf, Ebû Mensûr er-Rezaz; zanyarîya feraîzê⁵⁸ li cem Şêx Ebu'l-Mizaferê kurê Şehrezorî Atar; zanyarîya rêsîmanê li cem Şêx Ebû Mensûr Cewaliqî û zanyarîya hedîsê jî li cem Îbnî Semerkandî, Evdilwehab Enmatî û Qazî Ebû Bekir xwendine.⁵⁹ Ji xeynî van ji alimêni mezin ên wekî Waiz Ebbadî û Xeznewî ders wergirtine û di sohbet û civatêni wan de cih girtiye. Di gel zanebûna wî ya van zanyarîyen din wisa xuya dike ku kêfa Ezreq bêtir ji zanyarîya dîrokê re hatiye û nivîsîna dîrokê bijartîye.”⁶⁰

Îbnu'l-Ezreq Tarîxu Meyyafariqîn nivîsîye û ji xeynî vê berhema wî tu agahî li ser hebûna berhemeke wî ya din li ber destan tune ye.

53 H.b., r.558.

54 H.b., r.559.

55 H.b., r.609.

56 Fariqî, h.b., r.638.

57 Awad, h.b., Teqdîm, r.19.

58 Ew zanist e ku piştî mirina mirovekî rêu'rêbaza belavkirina vê mîratê li gorî hiqûqa İslâmê şirove dike. (Mustafa Korkamaz Buhari, İslâm Miras Hukuku, Özcan ofset Matbaacılık, Gaziantep 2016, r.1.)

59 Fariqî, h.b., r.580-581; Awad, h.b., Teqdîm, r.34.

60 Awad, h.b., Teqdîm, r.33-34.

1.Taybetî û Girîngîya Tarîxu Meyyafariqînê

Destxeta Tarîxu Meyyafariqînê di muzeya British a li Londonê de ye. Li heman Muzeyê du nusxeyên berhemê hene. Ya yekem di beşa destxeta *Opb And MSS* bi nimreya *Or.5803an* tomarkirî ye û ji 400 rûpelî pêk tê û tê de bûyerên heta sala 572/1176an hatine vegotin. Nusxeya duyem jî di heman cihî de bi nimreya *Or.6310an* tomarkirî ye. Ev vusxe jî ji 276 rûpelan pêk tê û tê de bûyerên heta sala 560/1164an hatine vegotin.⁶¹ Li gorî agahîyên ku di beşa pêşî ya Tarîxu Meyyafariqînê de derbas dibin Fariqî di sala 572/1176an ev berhem nivîsiye.”⁶²

Girîngîya vê pirtûkê di warê avahîsazî, erdnîgarî, aborî, dîrok û ziman de ji bo lêkolîneran heye û wekî belgenameyekê ye ku agahîyên balkêş li ser gelek şûnwaran dide. Hin ji wan şûnwaran niha jî hene û hin ji wan ji negihane roja me. Cihin jê wî bixwe dîtine û agahîyên hinan jî “ji wan pirtûkên din ên wekî *et-Teş’is*⁶³ wergirtine.”⁶⁴ Girîngîyeke din a vê berhemê jî ev e: Fariqî li gelek cih û welatan gerîyaye û bûyer û karesatênu ku li van welatan qewimîne di berhema xwe de nivîsîne. Ji hêla aborî ve jî girîngîyeke wê heye. Lewra tê de agahîyên der heqê dahatuyên wê serdemê yên hin herêman û derxistina pereyan de hene. Girîngîyeke wê ya din jî ji hêla dîrokê ve ye ji ber ku Îbnu'l-Ezreq qala dîroka Meyyafariqînê û hin hûrgilîyên der heqê agahîyên wê de kiriye. Herwiha der heqê serdema Hemdanîyan, Buweyhîyan, Merwanîyan û Artûqîyan de jî agahî dane.

Ev pirtûk di warê ziman de jî xwedî giringîyekê ye. Lewra rewşa pêşveçûnên rêzman û nûjenkirina hin têgehên hevedûdanî yên vê serdemê nîşan dide. Herwiha diyarbûna bandora zimanê herêmî di pirtûkê de xuya dike. Dîsa ev pirtûk pevguherdinê di navbera zimanê hemdem û erebîkirina hin peyvan de nîşan dide.⁶⁵

Îbnu'l-Ezreq di rêvebirîya karêne dewletê yên girîng de cih girtiye û ji ber vê taybetîya wî tiştên ku di serdema xwe de nivîsîne wekî belgeyên fermî ku bi destêne rayedarên dewletê hatine nivîsîn, tên hesibandin. Li ser vê yekê jî em dikarin bibêjin ku ev berhema wî wekî belgeyeke fermî ya dewletê ye û ji alîyê dîrokî ve pir girîng e.”⁶⁶

Herêma Rojhilata Navîn ji alîyê rojhilat ve bi êrîşa moxolan re rû bi rû maye û ji alîyê rojava ve jî ji ber êrîşen xaçperestan gelek karesat hatine serê wê û wêran bûye. Ji ber vê hindê berhemên ku di sedsala VII/XIIan de der heqê vê herêmê de hatine nivîsîn û gihaştine roja me pir hindik in. Loma jî hebûna vê berhemê

61 el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.7,12.

62 Fariqî, h.b., r.102.

63 Teş’is peyveke suryanî ye. Navê pirtûkeke dîrokî ye ku dîroka Meyyafariqînê ya berî İslâmê vedibêje. (Bnr. El-Xûlî&Baluken, h.b., Jêrenot:1, r.103.)

64 el-Xûlî&Baluken,h.b., Teqdîm, r 103.

65 H.b., Teqdîm, r.68-79.

66 Awad, h.b., Teqdîm, r.4.

tiştekî biqîmet e. Herwiha ji ber ku di vê berhemê de agahîyên bêhempa yên der heqê Anadolê û dîrok û erdnîgarîya Rojhilata Navîn de hene berhemeke girîng û hêja ye.⁶⁷

Îbnu'l-Ezraq der heqê gelek eşîr û xanedanên kurdan de agahî dane. "Ji nav van ên ku bi awayekî gelek berfireh û hema bêje sal bi sal Îbnu'l-Ezraq agahî der heqê wê de dane Merwanî ne."⁶⁸

Taybetîyeke din a vê berhemê jî ew e ku Îbnu'l-Ezreq wekî hin nivîskarêñ din ev berhema xwe ne li ser daxwaza siltanekî û xelîfeyekî yan jî hevalêñ xwe nivîsiye. Wî berhema xwe ji bo xwe, ji bo zanîna dîrokê ku pê re mijûl dibû û jê hez dikir, nivîsiye. Yanî vê hezkirina wî ya ji Meyyafariqînê berhemeke wiha giranbiha pê daye nivîsin.⁶⁹

Hin berhemêñ dîrokî yên kevin ku negihaştine roja me, navêñ wan di vê berhemê de derbas dibin û ji van berheman agahî hatine wergirtin. *Tarîxa Mûsilê* ya Mihemedê kurê Elî Şimşat û *Dîroka Bexdayê* ya Teyfûrê kurê Ebî Tahir ji van berheman in.⁷⁰ Ev jî girîngîyeke din a vê berhemê ye. Lewra bi xêra vê pirtûkê haya me ji van berheman çêbûye.

Gelek dîroknûsên piştî Îbnu'l-Ezreq ji pirtûka wî sûd wergirtine. Bêguman ev rewş jî qîmeta vê berhema wî nîşan dide. "Sibt Îbnu'l-Cewzî di pirtûka xwe ya bi navê *Mîratu'z-Zeman* de, Îbnu'l-Edîm di pirtûka xwe ya bi navê *Buxye't-Teleb fi Tarîxî Heleb* de, Îbnu'l-Xelikan di pirtûka xwe ya bi navê *Wefayatu'l-Ayan* de, Îbnî Şeddad di pirtûka xwe ya bi navê *el-Alaqu'l-Xetître fi Zîkrî Umerâş-Şam we'l-Cezîre* de, Zehebî di pirtûka xwe ya bi navê *Tarîxu'l-İslam* de, Safedî di pirtûka xwe ya bi navê *Sahîbu'l-Wâfi bi'l-Wefeyat* de, Îbnî Kesîr di pirtûka xwe ya bi navê *el-Bîdaye we'l-Nîhaye* de, Rizqillah bîn Yûsuf di pirtûka xwe ya bi navê *Şûeraû'n-Nesraniyye* de, Îbnu'l-Qelansî di pirtûka xwe ya bi navê *Zeylu Tarîxî Dimeşq* de⁷¹ Îbnu'l-Esîr, di pirtûka xwe ya *el-Kamîl fit-Tarîx* de, Yaqt el-Hemawî di pirtûka xwe ya bi navê *Mucemu'l-Buldan* de, Aynî di pirtûka xwe ya bi navê *Tarîxu'l-Aynî* de ji pirtûka Îbnu'l-Ezreq gelek agahî neqil kirine. Ji van kesan Îbnu'l-Esîr ev agahîyên xwe yên ku ji Ezreq girtine bi şêwaza xwe şîrove kirine û tiştin li wan zêde kirine. Lê wan kesên din gotinêñ Ezreq rasterast neqil kirine. Kesên wekî Îbnî Xelikan, Sibt Îbnu'l-Cewzî û Îbnî Şeddad wextê agahî ji pirtûka wî veguheştine wekî çavkanî behsa pirtûka wî jî kiriye. Lêbelê kesên

67 Ercan Gümüş, "Îbnu'l-Ezrak Ve Eseri Meyyâfârikîn ve Âmid Tarihi Üzerine Türkiye'de Yapılan Çalışmalar Işığında Bir Değerlendirme, E-Şarkiyat İlimi Araştırmalar Dergisi, ISSN: 1308-9633 Sayı: VII, Nisan 2012, r.4.

68 Necip Mansız, Îbnu'l-Esîr'in el-Kamil fit-t-Tarih Adlı Eserine Göre Kürtler ve yaşadıkları Bölgeler, Teza Lisansa Bilind a Neçapbûyi, Muğla Sıtkı Koçman Üniversitesi, 2015, r.120.

69 Awad, h.b., Teqdîm, r.12.

70 H.b., Teqdîm, r.14.

71 el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.64-66.

wekî Îbnu'l-Esîr û Yaqt el-Hemawî di van veguhestinê xwe de qet navê Îbnu'l-Ezreq negotine.”⁷²

Di nav van çavkanîyan de ji du berhemên ku agahîyên berfireh didin yek jê ya Îbnu'l-Esîr e. Li gorî Mansız Îbnu'l-Esîr di berhema xwe de ji damezrandina Mîrnîşîna Merwanîyan heta hilwesîna wan agahîyên giring dide û wî ev agahîyên xwe hemû ji Îbnu'l-Ezraq wergirtine.⁷³

2. Naveroka Tarîxu Meyyafariqînê

Ji ber ku navê berhemê Tarîxu Meyyafariqîn e dibe ku wekî berhemeke ku tenê der heqê bajarê Meyyafariqînê de hatibe nivîsîn xuya bike. Lîbelê di vê berhemê de agahîyên çandî û siyasî yên serdemêñ kevin û bi taybetî jî yên sedsala VI/XIIan ku Îbnu'l-Ezreq tê de jîyaye hene. Herwiha ev pirtûk behsa tevgerên mîr, wezîr, siltan û aliman dike û der heqê gelek welatan de agahîyan dide. Ji xeynî vê hin kevneşopîyên welatê ku Fariqî li wan gerîyaye jî di berhemê de hatine nivîsîn. Dîsa ev berhem behsa dewleta Emewîyan, xelîfeyên wan, pirsgirêkên nav dewleta wan û têkilîyên wan ên bi derûdorê re dike. Hewiha der heqê dewleta Ebbasî û xelîfeyên wan û rayedarêñ dewleta wan de jî agahîyan dide. Li ser mîrnîşîn û dewletêñ wekî Selçûqî, Merwanî, Atabeg û Artûqîyan ku li Şam, Iraq, Cezîre, Ermenistan û Îranê hatine damezirandin disechine. Têkilîyên van dewletan ên bi hev re û yên bi Endulus, Fatîmî û Bîzansîyan re tîne zîmîn.⁷⁴

Ji ber ku ev ev berhem bi awayekî giştî li ser dîroka dewletêñ rojhilata navîn hatiye nivîsîn û bi taybetî di warê dîroka rojhilat û başûrê rojhilatê Anadolê de gelek agahîyan dide bala lêkolîneran dikişîne ser xwe.⁷⁵

“Em ji berhemê têdigîhîjin ku Fariqî berhema xwe kiriye sê cild. Ji ber ku di pirtûka xwe de wextê hin mijaran vedibêje gotiye: ‘Me di cilda yekê an jî ya duyem de qala vê mijarê kiriye.’ Lîbelê heta niha em di pirtûkxaneyan de rastî van cildêñ din nehatine.”⁷⁶ “Dibe ku di cildê yekê de dîroka berî Islamê û destpêka afirandinê, di cildê duyem de dîroka Islamê û Pêxemberê dînê Islamê vegetibe.”⁷⁷ Lewra pirtûkêñ dîrokî yên serdema navîn bi gelempêri bi vî awayî hatine nivîsîn.

Mijarêñ pirtûkê di bin van beşan de kom dibin: Beşa yekem behsa xîlafeta Emerê kurê Xetab,⁷⁸ beşa duyem behsa rêvebirîya Muawîye,⁷⁹ beşa sêyêm behsa destpêka

72 Awad, h.b., Teqdîm, 22-23.

73 Mansız, h.b., r.120.

74 Awad, h.b., Teqdîm, r.1-2.

75 Gümüş, h.g., r. 13.

76 Savran, h.b., Teqdîm, r.1.

77 el-Xûlî&Baluken, h.b., Teqdîm, r.66.

78 H.b., r. 83-215.

79 H.b., r. 217-330.

xîlafeta Benî Ebbas,⁸⁰ beşa çarem behsa destpêka rêvebirîya Hemdanîyan,⁸¹ beşa pêncem behsa destpêka rêvebirîya kurdan li Meyyafariqînê⁸² û beşa şeşem behsa rêveberîya Necmeddin Xazî û bidestxistina wî ya Meyyafariqînê⁸³ kiriye. Ji xeynî van agahîyên dîrokî, Îbnu'l-Ezreq di berhema xwe de behsa mijarên çand û şaristanîyê jî kiriye û di vî warî de agahîyên berfireh dane.

3. Çavkanîyên Tarîxu Meyyafariqînê

Tê famkirin ku Îbnu'l-Ezreq di nivîsîna vê berhemê de agahîyên xwe ji sê çavkanîyan bi dest xistine: Ji ayetên Quranê û hedîsan, ji berhemên berî xwe yên dîroknasan, tefsîrnûs, erdnasan û ji kesê alim û zana wergirtine. Ji xeynî van, çavkanîya wî ya sereke ew agahî û tecrûbe ne ku di seranserê gera xwe de bi dest xistine. Lewra Îbnu'l-Ezreq, di pêvajoya gera xwe de bi kesên zana, waîz, beg û qralan re hevpeyvîn kiriye û der heqêzanîn û çandê de pirs ji wan kirine.⁸⁴ Wekî mînak wextê di sala 534/1139an de çûye Bexdayê û ji bo agahîyên der heqê şerê ku di navbera Siltan Mesûd û xelîfeyê Bexdayê de hîn bibe çûye cem Abdulkérîm el-Enbarî û ev agahî jê neqil kirine û nivîsîne.⁸⁵ Dîsa Fariqî dibêje: "Di sala 547/1152yan de ez li Bexdayê bûm û çûm cem Qudbeddinê Waîz û demekê li cem wî mam û ez jê gelek tiştan hîn bûm."⁸⁶

Îbnu'l-Ezreq hin agahîyên xwe jî ji gotinên bavê xwe ku wî jî ji Ebu'l-Hesenê kurê Ezreq ango ji bapîrê Fariqî bihîstibûn neqil kirine. Agahîyeke ku ji gotinên bavê xwe neqil kiriye wiha tîne ziman: "Bavê min di vê mijarê de ji rehmetîyê bapîrê min neqil kir. Bapîrê min gotiye: 'Wextê ez li Heskîfê nazir bûm Fexruddelewle Îbnî Cehîr ji min re got ku piştî gotinên falbaz sitendina vî welatî ket dilê min û di dema Mensûrê kurê Nizamedîn yê nevîyê Nesruddewle de min ev derfer bi dest xist.'"⁸⁷

Li gorî Savran, Fariqî, heta beşa Artûqîyan ji çavkanîyên nivîskî û rîwayetan sûd wergirtiye û ji beşa Artûqîyan û vir ve di pirtûka xwe de bêtir cih daye bûyerên ku rastî wan hatiye.⁸⁸ Ji ber ku di serdemâ Artûqîyan de Fariqî diji û di rêvebirîya dewleta Artûqîyan de cih girtiye.

80 H.b., r. 337-415.

81 H.b., r. 418-444.

82 H.b., r.449-705.

83 H.b., r. 663-695.

84 Awad, h.b., Teqdîm, r.13.

85 Fariqî, h.b., r.567-568.

86 H.b., r.596.

87 H.b., r.503.

88 Savran, h.b., Teqdîm, r.18.

Bi giştî çavkanîyên ku Îbnu'l-Ezreq ji wan sûd wergirtine ev in:

*“Futuhu'l-Buldan a Belazûrî yek ji wan çavkanîyan e ku Îbnu'l-Ezreq jê sûd wergirtiye. Dema ku Fariqî behsa şerê Qadîsiyeyê yê di serdemâ Emerê kurê Xetab kiriye ji vê berhema agahî wergirtine. Berhema duyem a ku Fariqî jê sûd wergirtiye û jê agahî dane pirtûka bi navê et-Teşîs e. Ev pirtûk li keşîşxaneya hikumdarîyê ya bajarê Meyyafariqînê bû û ji sûryanî ber bi erebî ve hatibû wergerandin. Der heqê vê pirtûkê de Fariqî wiha dibêje: ‘Ez pê hesiyam ku li keşîşxaneya hikumdarîyê pirtûkeke bi navê et-Teşîs heye û qala vî bajarî û avakirina vê keşîşxaneyê dike. Ez çûm min ev pirtûk ji vê keşîşxaneyê anî û min bir cem zilamekî fileh. Vî kesê fileh dixwend û wateya wê bi erebî ji min re digot.”*⁸⁹

“Fariqî ji pirtûka Îbnî Kutaybe ya bi navê *Kîtabu'l-Mearîf* jî sûd wergirtiye û dema der heqê Miawîye, Emewî û Ebbasîyan û xelîfeyên wan de agahî dane ev pirtûk wekî çavkanîyekê nîşan daye. Pirtûkeke din a ku Îbnu'l-Ezreq agahî jê neqil kirine *Tarîxu Bexdad* e. Ev pirtûk a Teyfûrê kurê Ebî Tahir e. Fariqî der heqê Emewî û kirinên wan ên nebaş de ji vê pirtûkê agahî wergirtine û neqil kirine. Îbnu'l-Ezreq ji *Tarîxu'l-Musul* a Mihemedê kurê Elîyê Şîmşatî ku di sala 440/1049an de hatiye nîvîsin agahî wergirtine. Wî agahîyên der heqê şerê faris û roman, standina faris û roman a bajarên Diyarbekirê, Dîyarîrebîa û bajarê Meyyafariqînê û mayîna Meyyafariqînê ya di bin hikmê Kîsra Kubazê hikumdarê Sasanî yê (Bz)19. de ji pirtûka Dinewerî ya bi navê *el-Exbarû't-Tîwal* wergirtiye. Fariqî der heqê misilmanên pêşî, Hz. Emer, Elî, Fatîma û yên der heqê bilindbûna meqamê Hz. Hesen û Hiseyîn de ji *Tefsîru'l-Wehîdi* agahî wergirtine. Tefsîrên din ên ku Fariqî hin agahî ji wan wergirtine *Tefsîru'l-Salebî* û *Tefsîru'l-Evdilwehab* in. Fariqî mijarê der heqê zilm û zordestîya xelîfeyên Emewî û alozîyên di serdemâ xelîfe Hz. Osman de ji van her du tefsîran wergirtine. Dema Îbnu'l-Ezreq behsa xelîfeyên Ebbasîyan û dewlemendîya dewleta wan kiriye ji berhema Sûlî ya bi navê *Tarîxu'l-Sûlî we Ewraqu'l-Sûlî* sûd wergirtiye û dema ku qala Yezîdê kurê Miawîye û mirina wî kiriye ji berhema Ebû'l-Ferec el-Îsfehanî ya bi navê *el-Exanî* hin agahî wergirtine. Îbnu'l-Ezreq ji pirtûkên gelek tefsîrnûs û zimanzzanan ên wekî *Sabiî*, *Îbnu'l-Şecerî* û *Hafiz bîn Asakîr* agahî wergirtine. Ji xeynî van, ji gelek pirtûkên din jî sûd wergirtiye lêbelê der heqê wergirtina van agahîyan de çavkanî nedane. Tenê gotiye: ‘Di hin pirtûkan de wiha nivîsandiye, min wiha dîtiye.’⁹⁰

Fariqî agahîyên ku ji van pirtûkan wergirtine rasterast nenivîsîne tenê yên ku bi mijarê re têkildar in şirove kirine û kurteya wan nivîsîye. Di van şiroveyan de ev agahî nirxandine û alîyê wan ên rast û şaş jî vegotine.⁹¹

89 Awad, h.b., Teqdîm, r.15

90 H.b., Teqdîm, r.15-19.

91 Savran, h.b., Teqdîm, r.18; Awad, h.b., Teqdîm, r.20.

4. Rêbaza Tarîxu Meyyafariqînê

Îbnu'l-Ezreq di nivîsîna vê berhema xwe de çar rêbazên sereke bi kar anîne. Berhemên nivîskî yên berî xwe xwendine, li rîwayetên mirovan û şahîdên bûyeran guhdarî kiriye û herwiha ji bûyer û rûdanênu ku di gerên xwe de dîtine sûd wergirtiye.⁹²

Îbnu'l-Ezreq di vê pirtûka xwe de wekî piranîya dîroknûsên rojhilat û rojavayî bi destpêkeke berfireh dest bi berhema xwe kiriye. Di pirtûka xwe de agahîyên berfireh ên sedsalên berê yên der heqê mijarên ku vegotine de dane.⁹³ Wî bi rêbaza kevneşopîyeke îslamî ji afirandina mirovan dest bi nivîsînê kiriye û heta serdemâ xwe hatiye.⁹⁴

"Zimanê berhemê erebî ye û li gorî Awad di warê ferheng, rêtizman û rastnivîsa erebî de di pirtûkê de hin şâşî hene. Awad sedemê van şâşîyan wiha tînê ziman: "Xuya ye kesê ku ev nusxe nivîsiye ji wan nivîsvanan e ku nivîsa wan xweşik e; lê wateya tiştên ku dinivîsin nizanin. Tê famkirin ku ev pirtûk ji alîyê nivîsvanekî tirk ve hatiye îstînsaxkirin."⁹⁵

"Îbnu'l-Ezreq dema behsa serdemên kevin kiriye neketiye hûrgilîyan û ev mijar bi kurtayî vegotine. Mesela dema behsa serdemâ çar xelîfeyên Îslamê kiriye li ser feth û guherînên wan ên di warê aborî û rêvebirîyê de nesekinîye. Mesela bi kurtayî behsa dîroka Emewî û Ebbasiyan kiriye. Ji ber vê yekê jî mirov dikare van hêlên wê wekî qelsîyeke pirtûkê bihesibîne. Her çiqas Îbnu'l-Ezreq bi berfirehî li ser van mijaran nesekimî be jî gelek tiştên ku di pirtûkên dîrokî yên berfireh ên dîroknûsên wekî Îbnu'l-Esîr, Îbnî Şeddad, Ebu'l-Fîda de tunin di berhema wî de derbas dibin."⁹⁶

5. Xebatênu Ku Heta Niha li ser Tarîxu Meyyafariqînê Hatine Kirin

Heta niha li ser Tarîxu Meyyafariqînê hin xebat hatine kirin. Xebata pêşî ya li ser vê pirtûkê ku têzanîn a Henry Frederîk Amdroz e. Piştra Vladimir Mînorsky li serê xebitîye. Pişti van rojhilatnasnan Bedewî Evdilletîf Awad beşa Merwanîyan weşandiye û Mehmet Emîn Bozarslan ev xebata Awad wergerandiye tirkî. Pişti Bozarslan Ahmet Savran jî beşa ku der heqê Artûqîyan de ye wergerandiye tirkî. Lê cara pêşî ev pirtûk bi temamî ji hêla Karim Farouk û Yusuf Baluken ve hatiye weşandin.

92 H.b., Teqdîm, r.18.

93 Awad, h.b., Teqdîm, r.1.

94 Savran, h.b., Teqdîm, r.1.

95 Awad, h.b., Teqdîm, r.5-6.

96 H.b., Teqdîm, r.14.

Di vî warî de teblîxeke Ali Sevîm jî di Kongreya Dîroka Tirkan a VI de li ser weşana Tarîxu Meyyafariqînê ya ku ji hêla Awad ve hatiye weşandin heye.⁹⁷

Jî xeynî van xebatan “Elî Emîrî di pirtûka xwe ya bi navê “Wilayetu'-Şarqiyye”de der heqê vê berhemê de wiha nivîsiye: “Di sala 1895an de dema ez li Erziromê defterdar bûm, endamê meclîsa revebirîya Erziromê Alemdarzade Derwîş Efendî ji min re got ku berhemek der heqê vê herêmê de heye. Lê Huseyin Paşa hat cem min û got ku ev berhem ne li ser Erziromê lê li ser Diyarbekir û Meyyafariqînê ye. Dema bav û kalên min hatine van deran wan bi xwe re anîye û ev berhem niha li cem Mele Resûl e.” Li gorî Elî Emîrî ev berhem, Tarîxu Meyyafariqîn a Îbnu'l-Ezreq e. Elî Emîrî nêzî bîst û pênc salan li pey şopa vê pirtûkê ketiye lê bi dest nexistiye.⁹⁸

5.1. Xebatê Amedroz û Mînorsky

Ev xebat ji du nivîsên Rojhilatnasê Îngîlîz Amedroz ên ku di rojnameya bi navê Jurnal a Cemîyeta Asyayê de hatine weşandin û hin lêkolînên kurt ên ku ji hêla rojhilatnasê wekî Mînorsky ve hatine kirin pêk têن.⁹⁹

Amedroz di sala 1902yan de gotereke bi navê *The Journal of the Royal Asiatic Society*¹⁰⁰ weşandiye. Wî di vê gotarê de der heqê Tarîxu Meyyafariqînê de agahî dane. Amedroz der heqê destxeta vê pirtûkê de gotiye: “Tê texmînkirin ku destxeta vê pirtûkê di sedsala heftem ya koçî de li Şamê hatiye dîtin.”¹⁰¹

Mînorsky jî di gotara xwe ya bi navê *Caucasica in the history of Mayyafariqin* de qala her du nusxeyên pirtûkê kiriye û besên pirtûkê yên der heqê Şeddadîyên Tiflisê de wergerandine îngîlîzî.¹⁰²

5.2. Xebata Bedewî Evdillettîf Awad

Bedewî Abdullatîf sala 1946an ji bo lêkolînê çûye Îngiltereyê û ev berhem li Muzyea Londonê bi dest xistiye û li ser vê berhemê xebitîye. Awad ev xebata xwe ya li ser vê berhemê ku wekî tezeke doktorayê hatiye amadekirin di sala 1956an de çap kiriye.¹⁰³ Wî tenê besa pirtûkê ya der heqê dewleta Merwanîyan de weşandiye. Sebebê bijartina vê besê jî wiha anîye ziman: “Ji ber ku pirtûk mezin bû ji bo xebata li ser hemû besan û amadekirina wan a ji bo weşanê dem pir lazim bû, min biryar da ku pêşî ji vê besê dest pê bikim û piştra vê xebatê bes

97 Ali Sevim, “Tarihu Meyyafarîkin ve Amid, VI. Türk Tarih Kongresi”, Ankara, 1967.

98 Ali Emîrî, Osmanlı Vilayât-i Şarkiyesi, (Amadekar. Taş, K. Z. Ü yên din.) Ankara İlahiyat, Ankara 2005, 57-58. Vhg. Gümüş, h.g., r.5.

99 Awad, h.b., Teqdîm, r.10-11.

100 Henrî Frederîk Amedroz, “Three Arabic MSS. on the History of the City of Mayyâfâriqîn”, Great Oct., 1902, Cambridge University Press, r.785.

101 Amedroz, h.b., r.785.

102 : Vladimir Minorsky, “Caucasica in the History of Mayyafariqin”, Source: Bulletin of the School of Oriental and African Studies, University of London, Vol.13, No. 1 1949, pp. 27-35.

103 Awad, h.b., Teqdîm, r.2.

bi beş di demên cuda de biweşînim. Lewra ev beşa der heqê dewleta Merwanîyan de yek ji besên pirtûkê ya girîng bû. Ev beşa ku ez ê biweşînim ji heştê rûpelên pirtûkê pêk tê.”¹⁰⁴

Wekî ku me berê jî gotibû li Muzeya British a Londonê du destxetên vê pirtûkê hene. Awad di sala 1959an de li Qahîreyê bi navê *Tarîxu'l-Fariqî* xebata xwe ya li ser beşa Merwanîyan çap kiriye.¹⁰⁵ Piştî ku Awad ev berhem dît û li ser xebitî, berhem dîsa hat rojevê û fikra ku ev pirtûk serdemeke dîrokê ronî bike derket pêş.¹⁰⁶

Piştî Awad, Savran jî li ser vê berhemê xebitîye, beşa li ser Artûqîyan werge-randiye tirkî û behsa xebata Awad jî kiriye. Lê Savran dibêje: “Awad tenê li ser nusxeya dirêj xebitîye û jî ber ku ji nusxeya kurt sûd wernegirtiye li gorî bawerîya min ev xebat qels maye.”¹⁰⁷ Li gorî Awad, ya eslî nusxeya berfireh e, lê ew dibêje: “Min her du nusxeyê pirtûkê dane berhev û cudahîyên wan di jêrenotan de destnîşan kirine.”¹⁰⁸

Awad behsa xebatê Amedros û Mînorsky ên ku li ser vê berhemê hatine kirin jî dike.¹⁰⁹ Ji pêşgotina wî tê famkirin ku piştî xebata li ser vê besê, dixwaze li ser wan bêşen din jî bixebite û wan biweşîne.¹¹⁰ Lê ji xeynî vê beşa pirtûkê tu besên din ku ji vê pirtûkê ji alîyê wî ve hatine çapkîrin nayêن zanîn.

5.3. Xebata Mehmet Emin Bozarslan

Bozarslan ew berhema ku Bedewî Evdilletîf Awad li Qahîreyê çap kiribû wergerandiye tirkî û di sala 1975an de çap kiriye. Wî pêşgotina Awad a ku der heqê pirtûkê de ye jî wergerandiye tirkî û ew pêşgotin xistiye serê xebata xwe.¹¹¹ Herwiha Bozarslan gelek jêrînotênu ku Awad nivîsîne û der heqê gelek kes û cihan de agahîyê didin wergerandine tirkî û gelek agahîyên din li wan zêde kirine. Welî din jî li ber dîrokê koçî ku di pirtûkê de derbas dibin di nav kevanekê de mîladîya wan nivîsîye.¹¹²

5.4. Xebata Ahmet Savran

Ahmet Savran jî besên vê pirtûkê yên dawî ku der heqê Artûqîyan de ne, wergerandine tirkî û di sala 1992yan de li Erziromê çap kiriye. Ew di destpêka xebata xwe de tînê ziman ku her du nusxeyê vê pirtûkê dane berhev û bi vî awayî

104 H.b., Teqdîm, r. “h”.

105 Îbnu'l-Ezraq, *Tarîxu'l-Fariqî*, (Thq. Bedewî Evdilletîf Awad), Qahîre 1959.

106 Gümüş, h.b., r.13..

107 Savran, h.b., Teqdîm, r.7.

108 Awad, h.b., Teqdîm, r. “r”

109 H.b., Teqdîm, r.10,11.

110 H.b., Teqdîm, r.“h”

111 Îbnu'l-Ezraq, *Mervanî Kürtleri Tarihi*, (Wer.Mehmet Emin Bozarslan), Koral, Stenbol 1990, Teqdîm, r.9.

112 Bozarslan, h.b., Teqdîm, r.6.

agahîyên ku di yekê de kêm in bi yên din temam kirine. Herwiha ev destnîşan dike ku wergera wî ji besên dawî yên nusxeya kurt û yên nusxeya berfireh pêk tê.¹¹³

Savran der heqê vê xebata xwe de wiha dibêje: “Ya baş ew bû ku ev berhem bi tevahî hatibûna wergerandin. Lêbelê ji ber ku berê, besa Merwanîyan hatibû weşandin¹¹⁴ û besa Artûqîyan ji hêla dîroka tîrkan ve bêtir girîng bû min ev bes hilbijart.¹¹⁵
